


# PIRS

*Kovareke  
rewşenbîrî  
serbixweye*



Hejmar :15-sal:6-payîz: 1998 Z - 2611 K



## SERCEM

### Nameyeke Vekirî

2

#### Beberîya

- |                              |                |    |
|------------------------------|----------------|----|
| * Şano di kovara Çiya de...  | Dr. P. Berwarî | 3  |
| * Cegerxwîn ê çiroknivîs ... | H. Gundî       | 7  |
| * Derbdayîn di zimanê ....   | Kamiran Bêkes  | 13 |
| * Nezîr Palo û ...           | H. Mîranî      | 16 |

#### Beberîya

- |                            |                |    |
|----------------------------|----------------|----|
| * Sebrî Botanî ....        | Konê Reş       | 21 |
| * Kî berpirsiyar e? ...    | Rezo           | 26 |
| * Salvegera R. Bedirxan... | Dilawerê Zengî | 30 |
| * Aboneyên Hawar ê...      | Dilawerê Zengî | 33 |

#### Beberîya

- |                              |               |    |
|------------------------------|---------------|----|
| * Li gel Dr. Celîlê Celîl... | Andamê Pirs ê | 36 |
| * Li gel Yûsif Bekir ....    | Zamdarê Zindî | 40 |

#### Beberîya

- |                          |              |    |
|--------------------------|--------------|----|
| * Teqîna Derd û ...      | M. N. Xurşîd | 42 |
| * Mirin ...              | Awazê Kalo   | 43 |
| * Şikestina Dîlanekê ... | Dildarê Aştî | 44 |
| * Ez û Dilber...         | Seyyid Helîm | 45 |
| * Zindan ...             | Keleş        | 46 |

#### Beberîya

- |                      |                    |    |
|----------------------|--------------------|----|
| * Mar dûvê ...       | Danehev: Alî Cefer | 48 |
| * 1915...            | Pîr Rustem         | 49 |
| * Goristana Welêt... | Lewendê Dafînî     | 52 |

#### Beberîya

- |                          |       |    |
|--------------------------|-------|----|
| * Mijûlî , Metelok û ... | Salar | 53 |
|--------------------------|-------|----|

#### Beberîya

- |                                     |  |    |
|-------------------------------------|--|----|
| *Tûrikê Pirs ê...                   |  | 56 |
| *** Daxuyani li ser Xelata O. Sebrî |  | 54 |

## *Nameyeke Vekirî*

### *Xwendevanên birêz !*

Va ye hejmareke nû ji "Pirs" a we di nav destên we camêran de ye. Xuya û aşkere ye ku durvê wê piçekî hatiye guhartin; hin rûpel li wê zêde bûne.

Helbet ev guhartina bivê-nevê bû. Çunkî, gelek gotar û berhemên we yên curecure û hêja dikevin destên me. Vêca, da ku "Pirs" kanibe wan di hembêza xwe de bipejirîne, me pêwistî dît ku em çend rûpelan li wê bêtir bikin. Ji aliyekî din ve me, li ber daxwaza hinde zarokên zimanhez û li hember êrîşa nameyên wan, rûpelekî zarokan jî zêde kir. Em hêvîdar in ku ew jî bi tiliyên xwe yên nazik û dilên xwe yên sipî xwedî li rûpelê xwe derkevin û wî pêşve bibin.

Hêvî ew e, xwendevan û nivîskarên hêja, ku wî li "Pirs" a xwe hertim xwedî derkevin; li dora wê kom bibin; bixwînin û bidin xwendin; bi berhem û nivîsarên xwe wê dewlemend û rengîntir bikin. "Pirs" bi we heye û bi we tê parastin; çande, wêje û zimanê Kurdî jî bi "Pirs"ê – û xwişkên wê- tê parastin û pêşvebirin. De werin em hemî bi hev re ala çand, wêje û zimanê Kurdî bilind hildin.

Belê, temen, dewlemendî û tîraja her weşanekê bi xwedîlêderketina xwendevan û nivîskarên wê ve girêdayî ye.

### *Nivîskarên hêja !*

Bang û vexwendina me li we ye, rûpelên "Pirs" ê ji we re vekirîne, em jî her û her li hêviya lêkolîn, gotar, helbest, çêrok û behemên we yên dîtir in. Belkî bêtirin em çavrêya lêkolînên we dikin.

Di vê nama xwe ya vekirî de jî em sozdar in ku emê, eger di pêşerojê de pêdivî çê bibe, "Pirsa" a we ferehtir bikin û rûpelên wê hîn bêtir bikin. Tenê tik û lava me ew e ku lêkolînên we ji (6-7) rûpelên pirsê ne bêtir bin. Nexêr, emê bêçar bibin wan bi şeweyekî zincîrane biweşînin.

Ta hejmar û hevdtîneke din, bimînin di xweşî û serfiraziyê de.

*Rêdeksiyon a "Pirs" ê*




# Kovara “Çiya” Awêna Çanda Kurdî li Ewropa

1965 - 1970

Dûmahîka hej: 10

## Şano di kovara “Çiya” de “Birîna reş” di kovara “Çiya de”



**“Mirov ne ji bo roja şemiyê ye, roja şemiyê ji bo mirov e, civak ne ji bo hunermend e, hunermend ji bo civakê ye”**  
**“Pîlêxanov”**

Berî ku em naveroka şanoyê û bawerdanên xwe li ser wê, di vir de rêxin, em pêwîst dibînin, ku em gelek bi kurtî li ser jiyana û xebatên pakrewanê zindî Muse Enter rawestin.

Nivîskar di sala 1918 an de, li gundê Zivingê. nizikê Nisibînê ji dayika xwe bûye, M. Enter beşê bervedêriyê li Istenbolê kuta kiriye.

Jina Muse Enter keça nivîskarê Kurd Ebdil Rehman Rehmî Elhikariye, û xasiya M. Enter neviya mîr Bedirxan e.

Zarên wî Enter, Dicle, û Reşê niha li gel dayika xwe li Ewropa dijîn.

M. Enter di sala 1948 an de, rojnama “Kaniyên Dicle” derdixist, û kovareke rêzanî “Kovara Rojhilat” di sala 1950 î de diweşand, dîsan, wî û bi çend hevalên xwe ve rojnameke rojane bi navê “Welatê Pêşketî” di sala 1958 an de çap dikirin.

M. Enter bêtirî 20 caran ketiye zîndanên koledaran, gava ew di salên (1959 - 1963) tev (49) hevalên xwe ve, dikevin girtîgehê, destlatê biryara darvekirina wî û bi çend hevriyên wî wek Dr. Şivan, Seid Alçî, (herdu jî şehîdî) û Yeşar Kaya (serokê Perlemana Kurdî li dervayî welêt) derdixist, lê ew biryara setemkar pêk nehat.

Di vê dawiyê de M. Enter di rojnama “Welat” di bin koşeyekê cîwest “Tîr” de û herweha di pir weşanên din de û bi du zimanan; Kurdî û Turkî dinivîsand, di 20/09/1992. an de, ew bi destên têrorîstên dewleta Turkan tê şehîdkirin, û hin berhemên wî yê çapkirî evin:

1- Qenbel, (1962).

2- Yara Salar (1964).

3- Birîna Reş (1965).

4- Ferhenga Kurdî (1967).

Nivîskar û rojnamevanê gewre M. Enter şanoya xwe hîn di sala 1959 an, di girtûgeha leşgerî de, li Istenbolê nivîsiye, lê, ew di sala 1959 an de çapnekiriye, du perde tenê ji "Birîna Reş" di kovara "Çiya", ji hejmara sisiyan û ta hejmara heştan de belavbûne, lewre, ev şanoya jî di vê lêkolîna me de dibe mijareke serbixwe û bingehîn.

### **Naveroka şanoyê pir bi lez :**

"Birîna Reş" ji çar perdan, di hundirê (40) rûpelan de pêkhatiye, bûyerên sê beşên pêşin li gundê Zoravê, nêzikî Nisîbînê. di malê cotarekî belengaz "Biro" de, derbazdibin.

Zêno jî, wek mêrê xwe Biro li nik axayê gund ji bo kevçiyek dew berdestiyê dike, çend zarên wan bi nexwaşa reş mirine, û lawê wan Bedo tenê xweşe, û li xwendegeha Amedê dixûne.

Biro û Zêno di mala xwe ya axî de rûniştine û li ser rewşa xwe ya darayî û xwendina Bedo dengdikin, Biro xwendina Bedo bê wate dibîne, lê, Zêno pir ji xwendinê hez dike, û ew herdu jî, li ser sedemên birîna reş lihevna, Zêno zane ku, ev derda ji tovên dermankirî ye, ew tovên ku, karbidestan vê pere dane axan, û ew jî, ji xwere, wan difroşin mîletê xwe, lê ew pê nexwaş dibin. Ew hîn di vê dan û standinê dane, kalemêrek bi navê Mîsto li wan dibe mêvan, û ew jî, xwe tevî axiftinên wan dike û dibêje dest û lingên me girêdayî ne, yanê, ew rewşa reben û zîvaran bi çarenusê ve dibestîne, Zêno vê baweriyê napejrîne, lewre jî, Bedo bi rêya henekan dibêje, çawa ez bi Zêno ketime.

Di perdê duduyan de, Bedo ji Amedê vedigere gundê xwe, Zêno bi kutahiya xwendina lawê xwe pir dilşad e, lê Biro jî, her dem dibêje, Bedo hîn nizane nîrê di stoyê gê ke, bi ser da jî, ew înan nake, ku lawê wî, cihê bilind di civakê de bistîne, çimkî ew ne kurê axa û begane, ji ber vê jî, eger ne ji Zêno ba, Biro lawê xwe nedîşand xwendinê, ew her sê hîn dipeyivin, sê mêvan ji gund hatin cem wan (apê Sado, Kelos, û Saroxan) apê Sado, Bedo, pîroz dike, û xwendina wî pir payebilind dinexîne, û ew bi riyên çend efsanan, setemkariyên axan û began dicerisîne, û dibêje hemî lawirên niha, berê mirov bûn, kê ji wan gunekarî û xerapî bi mirovan kiriye, Yezdan ew kiriye heywan, nimûne, kênefîs û leqleq jî, berê mirov bûn.

Di perda sisiyan de jî, her sê li malin, carek din apê Sado, Kelos û Seroxan tînin nik wan, apê Sado bi Bedo re dibêje, pêwîste gundiyan me ji tera û xwendina tera bi zornê û daholê din, û herwisa jî, Sado delametdarên hukumetê şermezar dike, çimkî ew gel dixûpînin.

Bedo dixwaze bibe endizyarê çêkirina cobarên avê û avdanê, û kêrhatiyên wan ji hemuyan re hewal dide.

Di perda çaran de, Bedo xwendina toxtiriyê li Istenbolê diqedîne, û ew di gel de û bavê xwe ve li Amedê dijîn, lê mala Biro ne wek ya li gunde, rewşa malê, ya diravî gelek rind bûye, lewre, Zêno pêşniyar dike, ku Bedo keça axê gundê Zoravê

ji xwe re bixwaze, lê ne Bedo û ne jî Biro bi vê pêşniyarê re dibêjin erê, Biro vê pendê bi jin û lawê xwe dide bîstin, "Her teyrek bi refê xwe re"

Ew hîn di maldane, jinikek lawkê xwe silo, yê ku, bi nexwaşiya reş ketiye, tîne cem Bedo, lê, Bedo alîkariya "Komela Dicle" li Istenbolê jibîrnakiriye, lewre jî, ew alîkariya hejaran dike, û pir bi rêzdarî li wan temaşe dike, Apê Sado û bi çend hevalên xwe ve, dîsan li nik van dibin mêvan, Bedo yê toxtir ji dayikên nexwaşan, û mêvanên xwe re dibêje, erê, pir zarokên me bi vê nexwaşiya reş mirine, lê ji vir û pêda, tu kes wê, bi vî derdî nemre, hemû şa dibin, û bi hev re sirûda netewî, ya gelê xwe, "Ey Reqîb" dixûnin.

### **Bawerdanek ramanî û rexneyî :**

Huner bi xwe durvek ji durvên pêzanîna civakî ye, ew li pêş erkên nûh, di hevdemê de destgîrêdayî namîne, Dîdro giringiyêke gewre dide mijarên hunerî û pêwendiyên wan bi jiyana cemaçê, û dibêje, şano di rêzên pêşîn, di hunerê de ye, ew kane rola xwe ya erênî di hunerê de, li pêşawî perwerdekirina civakê, di warên rêzanî û sinçî de bilîze.

Muse Enter jî, nerxbuhaya şanoyê û rola wê di jiyana gel de weha têgîştibû, nîrînen "Apê Muse" jî bi Dîdro re dibin yek, lewre jî, em di "Bîrîna Reş" de dibînin çawa nivîskar têde jiyana miletê xwe, yê jêrdest nîgarkiriye, û çawa zengilên netewayetî di ber hiş û hestên kurdan de, bi herdu destên xwe, yê tîkoşer lêdixê, û wênêkî ji civakê, di şanoyê xwe de radixê, lê çawa qehremanên wî rolên xwe dilîzin,?? û em çawa van rol û helwestan dinexînin ?? Di van çend rêzîkên jêrîn de, emê bi kurte birî diyar kin.

Biro mirovekî cotarî û nezane, pêşerojêke pêşketî di rewşênbîriyê de nabîne, lê jina wî Zêno bervajî mîrê xwe dirame, tevî ramanên wê, yê rêzanî û rewşênbîrî sakar û kêmin, giyana wê bi asoyêke rûgeş, têrhevî ye.

M. Enter rola jina kurd, di kesayetîya Zêno de, di awêna dîroka kurd de, bi erênî berçavdike. Lê, Biro nikane sedemên rastîn yê nexwaşiya reş têbigîne, wê, bi tovên kufîkî û dermankirî ve bibestîne, bi serda jî, wê nexwaşiyê bi Yezdan ve girê dide.

Apê Muse, bi jîrbûn û hişmendî folklorê kurdî, di rîya efsanan re dike çekêk rewê û dadgerek dadmend li dijî setemkariya derebegan, têde gunehkaran bê tawan nahêle û zordaran bi tujtîrî biryaran tawanbar dike, bi fermaneke çaranusî û oldarî, wan dike lawîr.

Bîrûbaweriyên bavê Bedo kevneperestî, nîrînen wî di sebareta xwendinê de gelek çewtin, ew di bin rastiyên zanistî de, yê ku Zêno pê bawerdikir, xwe dimelisînin, lewre, kurê wan Bedo dixûne, û guh nade bavê xwe yê şunketî, ew li dawiyê, dibê bijîşk û toxtiriyê li Amedê dike, kirasê belengaziyê ji dê û bavê xwe diçirîne, li wir jî, pir alîkariya nexwaşên hejar, kurdên bîndest dike, lê nîrînen Zêno û Bedo, ne herdem rastî hevtên, Bedo yê bijîşk naxwaze ramanên xwe di bawerîya dayîka xwe de bîpîşvîne, û bergehêkê di nav xwe û mala axê gund de dihêle, û wê diparêze, keça êxe naxwaze.

Di vir de, nîrînên bavê nezan û kurê ronakbîr dibin yek, di sebareta vê yekê, çend pîrsên giring bê vîna me, di ber çavên mera diçin û tîn, wek nimûne, çima toxtîrek rewşenbîr, di kok û regezê xwe de belengaz û cotarî, rê nade xwe ku keça axakî ji xwe re bixwaze ??

Eyan Bedo dixwaze bi vê biryarê, hevdijayetiya ramanî biterxîne, ??

Başe, eger axe tim axe bimîne, û azep tim hejar û azep bimîne, û her teyrek bi refê xwe re bifire, Ma yek ji armancên têkoşîna ramanên pêşverû, ne hilweşandina dîwarên sîkolocî, di nav çînên civakê da ye ?? Lewre, gava Bedo keça axê bixwasta, û êxe jî, ew bi wî da, bi ya me, pêngavek ji têkoşîna dirêj û dijwar dihat avêtin, belkî pir girêkek wireyî di vê lihevhatinê de, ji hev bişeliya, yan jî, bi kêmasî ew hinekî bihata pişkavtin, bi texmîna me, helwesta Bedo bi bîr û baweriyên dêmoqrat û ne şoreşgerî yên M. Enter ve girêdayî ye, lê, pêdivê, were gotin jî, nivîskar M. Enter, rewşa civakî û rêzanî ya Tirkîyê û Kurdistanê baş dibîne, zordariya karbidestên Turkan, axe û began bi qaserî awêna xwe ya taybetî pêş xwendevanên xwe dîke, ji ber ku, çekên ramanên wî, ne li gorî nexwaşiyên wê demê bûn.

Tevî vê têbînên me dermafê naveroka ramanî, ya "Birîna Reş" em diencimînin, ku M. Enter di berhema xwe de têkoşerekî netewperest û gewrebû, rêzaniya dewleta Turkan bi hemî cureyî şermezar dîkir, û hemû qehremanên şanoyê xwe bi zimanekî hêsan û têgîştî dengkirin dide, hemî alavên avahiya şanoyê bi awakî tekînkî baş bi karaniye, hemû ramnên xwe, ji bo gelê xwe û pêşxistina wî terxandiye, û baş zanî bû, ku "mirov ne ji bo roja şemiyê ye, roja şemiyê ji bo mirove, civak ne ji bo hunermande, lê hunermand ji bo civakê ye".

*Dumahîk heye*



## P ê ş b a z î

Bi têperbûna sed salî di ser rojnamegeriya Kurdî re, rêdeksiyona "Pîrs"ê pêşbirkekê, li ser rojnamegeriya Kurdî, li dardixe.

Mercên pêşbirkê:

- 1- Lêkolînek li ser kovarekê yan rojnameke bi zimanê Kurdî, li Sûriyê derketî, yan hîn ji derdikeve.
- 2- Rûpelên lêkolînê ne ji 6-8 rûpelê "Pîrs"ê pirtir bin.
- 3- Pêwîste ev lêkolîn ta 01-04-1999 bigî e rêdeksiyona "Pîrs"ê.

Têbîn : Encama pêşbaziye wê di 22-04-1999 an de bête ragiyandin.

# Cegerxwîn ê Çîroknivîs

Dûmahîka hej: 14

## Durvê hunerî yê çîroka “Reşowê Darî”

- 1 -

### Avakirina çîrokê

Gelek caran rexnevanan dubare kirî, û em jî dubare dikin û dibêjin naverokên afrandinan û durvên wan li gel hevudu girêdayînin, û bi carekê ji hev bi dûr nakevin, lê rexnevan ji neçare wan ji hev diqetîne, û her carê li nik yekî ji wan radiweste, da karibe karê xwe bibe dawiyê. Vêca piştî em hinekê li nik naveroka çîroka “Reşowê Darî” rawestan, û bi raman û nêrînên çîroknivîs re mijûl bûn, em dê li ba durvê hunerî, yê çîrokê jî rawestin, û wî diyar bikin, û nêrînên xwe jî di wê tengê re numa bikin.

Ta ku her afrandinek bibe celebekî wêjeyî, divê ew afrandin têkeve hindirê durvekî, her weha jî her celebekî wêjeyî durvek heye, ji durvên celebên dîtir cuda ye, durvê çîrokê jî li ser du tiştan de xwe pal dide; yek jê avakirin e, û yê dîtir tevna zimanewanî ye, û her yek ji wan herduwan li ser hin hêmanên hunerî pêk tê. Her weha hêmanên avakirina çîrokê evin : Bûyer, mirov, wate, û gaweke ronîkirinê.

#### 1- Bûyer :

Her çîrokek nûçeyekî pêşkêş dike, lê bi carekê nûçeyek, an hinek bi hevdu re, nabin çîrok, ji ber ku ji nûçe re wate divê, da ew şopeke tevayî bide. Ev şopa tevayî jî gelekî pêwîste, ta nûçe bibe çîrok, lê ne tenê şopa tevayî divê, belê bûyer jî.

Eger em li çîroka “Reşowê Darî” vegerin, em dê bibînin nûçeyên wê hemû li gel hev girêdayî nin. Heke em li wan nûçeyan yek bi yek mêze bikin, ew bi tenha wateyekê nade, lê tev bi hev re wê şopê, an wê wateyê didin, ew jî zor û sitema ku kedxwar û neyar li gundî û cotkar û gelê kurd dikin e. Lewre em dikarin bibêjin çîroka “Reşowê Darî” şopeke tevayî heye.

Lê ji vê pê ve, bûyer jê re divê, heya ku bi rastî bibe çîrokeke hunerî. Eger em bipirsin : ka bûyer çi ye?. Bê guman wê bersiv bê : Bûyer nûçeyekî xwedî destpêk, navîn û dawî ye, angosê tiştên divên henin heya ku yekîtiya bûyer tewaw bibe.



Di çiroka "Reşowê Darî" de, bûyer di her sê qonaxan re derbas dibe : Li destpêkê em dibînin dem şev e, gundî li eywana Zoro Axa civînin, serpêhatiyên dibêjin. Lewend; kurê Zoro qereza bi mêrxasiya Reşo dike, û wî neçare yî çûndina şikefta "Berdewêl" dike, ji ber ku dixwaze wî ji malê dûr bixe, da biçe mala wî, û dest dirêj namûsa wî bike.

Li navînê, em dibînin pîreka Reşo Lewend dike, laşê wî perçe perçe dike, wan perçan dixê hindirê çewalekî, hildide milên xwe, û diçe ku bavêje şikefta Berdewêl, Reşo li wir dibîna, û çiroka lewend jê re dibêje. Piştî wê li gel hevudu vedigerin mala Zoro, ji wî û ji gundiyan re rewşa xwe pêşkêş dikin, çavên Zoro Axa sor dibin, û dike qêrî ku wê wan bikuje, lê gundî piştigiriya Reşo dikin, lewre Zoro bi dizî mirovekî dişîna bajêr, da cendirman bîne, berde ser gundiyan.

Li dawiyê jî em dibînin cendirme tên gund, gundiyan, di gel Reşo û pîreka wî; Rewşê, li mala Zoro dicivînin, li wan didin, diravên wan distînin, hinekan ji wan berdidin, û yê dîtir bi xwe re dibin, lê bi rê de gundiyan tev berdidin, û Reşo û Rewşê dixin zîndanê. Gundî dest ji kar û berdestiya Zoro Axa berdidin, Zoro jî neçareyî koçbarkirinê dibe, û piştî hin salan Reşo û Rewşê ji girtîgehê tên berdan, li gundê xwe dizêvirin, û tev gundiyan jiyana xwe dibomînin.

Bi vî awayî bûyerê ve çirokê di her sê qonaxan re derbas dibe, û dighe dawî yê, û yekîtî ya xwe teqez dike.

## 2- Mirov (Kes) :

Rola kesnan di çirokê de roleke mezin û giring e, ji ber ku mirov bûyên çêrokî çêdikin, lewre birêveçûna bûyerekî ji destpêkê û navînê heya bighe dawiyê nade xuyakirin ku ew bûyer çima bi wî awayî bûye; ango çima bi wî awayî gîhaye wê dawiyê, û heya bûyerek jî yekîtî ya xwe tewaw bike, ne tenê bersivên van sê pirsan (çawa, li kur, û kînga webûye) jê re divên, lê bersiva (çima webû) jî gelek girin û pêwîst e. Yanê divê bûyer bersivên van pirsan gîşkan bide.

Çêkirina bûyeran bi kesên ve girêdayî ye. Vê lomê ne raste ku em bergehêkê têxin navbera mirov (kes) û bûyeran, ji ber ku bûyer bi xwe kesekî di kar de ye; yanê kirarekî di kar de ye.

Eger nivîskarek, di xebata xwe de bûyeran bê lêker pêşkêş bike, hîngê nivîsara wî ji nûçeyê ve nêzîktire, û ji çirokeke hunerî ve jî dûre, ji ber çîrok bûyerekî xwedî yekîtî pêşkêş dike, û yekîtî ya bûyer jî bê mirov, yanê bê kirar, ne tewaw e.

Di çiroka (Reşowê Darî) de mirov henin. Li dirêjiya wê dilivîn, ew jî evin:

- **Reşo** : cotkar e, li gund ber destên Zoro Axa, wek hemû gundiyan dîtir, dixebite, jîre, jêhatî ye, mêrxas û dilsoz e, û nezan e. Bi van rewşan di civatê de tê naskirin, çûndina şikeftê, nemaze di şevê de, mêrxasiya wî eşkere dike, û dide xuyakirin ku bi carekê tirs û saw li wî nebûne, û ne jî wê bibin, mêvan. Lê ew çûndina nezaniya wî jî sergirtî û veşartî nahêl e, ji ber ku ti caran ji xwe nepirsi ka çima Lewend ew bijart, û qerezên xwe pê kir.

Lê mixabin Reşo mêrxasiya xwe li pêş me biçûk û qels dike, ji ber ku, li hember Zoro Axa gelekî sist dibe. Guhdar wî bike çi dibêje : “**Axa ha serê mi û şûrê te, namûsa me teva namûsa te ye, emê tev rojekê xwe di ber te de bidin kuştin, tu serê me, û em lingê te ne**”. (Rûpel : 19). Eger mêrxasiya Reşo îro berê xwe nede, û wî neparêze, ma wê kînga kêrhatî be?. Bersiva vê pirsê di çîroka (Reşowê Darî) de nîn e.

Lê tiştê balkêş, di vê kesîtiyê de, ewe ku em hin caran Reşo bi Form û awakî dîtir dibînin. Eger xwendevan li rûpelên 38 an û 40 î ji çîrokê vegerin, wê Reşwekî dîtir bibînin; li vir de Reşo bi doza cîhanê tev mijûl dibe, û serê xwe pê re dêşîne, dipirse ka çawa ceng û şer û kuştin wê ji cîhanê rabin, û dîroka gelê kurd, a kevin tîne bîra xwe û me. Ma raste mirovê wek Reşo, di vê tengayî yê de, wê bi vî awayî biram e? û kînga? gawa diçe mala (çekûso) da diravan bi kar û fayîz jê bibe. A rast ew bû ku wê hingê Reşo bi doz û xelasiya xwe, û bi fayîza deyn û keysebazîya (çekûso) birama, û mijûl bîba.

Pêşkêş kirina Reşo, û livandîna wî, bi vî awayî, wî ji birêveçûn û meşîna bûyerê çîrokê bi dûr dixê, û dide xuyakirin ku çîroknivîs ji rastî ya hunerî, ya çîrokan bi alîkî dîtir de dikeve.

Divê çîroknivîs kesên çîrok bi xwe de girênede, lê serê wan berde, da ku gotinên xwe bibêjin, ne yê nîvîskar. Eger em li Reşo guhdar bin, gava li gel xwe dipeyive, bê guman, û yekser emê zanibin ev ne Reşo ye, lê Cegerxwîn bi xwe ye. Berî vê me dîtibû çawa Reşo bi zaraveke melûl bersiva Zoro Axa dida, û xwe wek lingê wî kiribû. Lê a naha jî bi şewakî dîtir dipeyive : “**Gerek mirov bêtir bîr bibira, bibûna dost û birayên hev, ev çi kuştin, talan, ceng û pevçûne?. Xwezî ev awa ji nav me zû rabûna, xwezî me zanibûna ka dermanê rabûna vê berberiyê çî ye? Ma ev dînya têra me nakî?. Ev top, bumbe, gule, berik dîteqin, mirova dikujin, xaniya dişewtênin, avaniya hildiweşênin, ev tev ji bona çî ye?. Xûyaye beg, axa, şêx, mela nahêlin weke bîra, her kes bi hev re bikin, û bi hev re bixun, ev ristika komelî a sermayedarî nahêlî kes bi xwezî geza nanê xwe bi pûrisênî, ev ristik tim kuştin, pevçûn, talan, û şewatî diafrênî .... A çê eve ku em terpelozekê li wa deynin, va xwînxwar û dijmina teva bikujin.**” (Rûpel : 38-39).

Mirovê ku xwe bixê cihê lingên dijminê xwe, wê nizanibe van gotinan bibêje, ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin eger Reşo di çîrokê de yeke, ne dudu ne, bê guman ev axaftinên jorîn yê Cegerxwîn, ne yê Reşo nîn.

- **Rewşê** : Hevaljiyana Reşo ye, bermala wî ye, li karê hindirê malê ye, arî Reşo dike, di karê xwe de jîr e, gelekî şeng û bedew e, lê bîndestê mêrê xwe ye jî. Eger wê bi tenha li malê bihêle, û biçê civîna gundiyan, şevan bibhorîne, Rewşê nikare dengê xwe bike. Jîneke weha bîndest bijî, bi rastî, wê ne jêhatî be, vê lomê jî kuştina Lewend jêhatî ya wê teqez nake.

Cegerxwîn ev pîreka, di çîrokê de kirbû nîşana jêhatî ya jîna kurd, lê nikaribû ev yeka sayî û zelal numa bikira, ji ber ku Rewşê neçareyî kuştinê bûbû. Her jinek xwedî rûmet, gava di şûna wê keve, wê wî karî bike, eger jêhatî ya wê heya dawî yê berdeyam bikira, me dikarî bigota jêhatî li nik wê kûr, tûj û xurt e. Daxwaza

çiroknivîsê me ew bû ku wê weha nasbikin, lê mixabin nikaribû ev daxwaz di navbera livandin û hejandina wê re eşkere wênebikira.

- **Lewend** : Kurê Zoro Axa ye, mêrê çar jina ye, pozbilinde, xwe di ser gundiyan re dibîne, keda wan duxe, dest ji kirên genî û qerêj bernade, ta ku ev kiran bûn sedema kuştina wî.

- **Zoro Axa** : Axa yê gund e, gundî li cem wî, û di nêrîna wî de kole nin, keda wan duxe, namûsa wan li pêş çavên wî pir erzan û bê biha ye, hevalbendê dijmine, cendirman berdide nava gund da zorê li gundiyan bikin, sedema gelek bêtarên gundiya ye, mirovatî û karên qenc di ferhenga têkiliyên wî de nînin.

Cegerxwîn ev her du kes (Zoro û lewend), li gor ramana xwe, rast livandin e, û wêneyê wan çêker û servekirî berçav kirî ye, Lewend zanibû merem û daxwaza wî genî ye, lê wê zanîne ew liwan nekir. Neqencî û xinizî jî ji Zoro dibarin, û diherikin. Ji me ve xuya ye ku merema Cegerxwîn ew bû ku em bi vî awayî van herdu kesan nasbikin, û bi rastî jî gîhabû vê yekê.

- **Soro** : Zana û pêşengê gundiya ye, hêdî ye, li gel xwe mijûl dibe, û diponije, baş guhdar e, gotin û bersivên wî pîvayînin, li nik gundiyan cihê pesnê ye, bandûra wî li wan mezin e. Zoro Axa jî hesabê wî dike.

Ev rewşên jorîn di soro de eşkere nin, lewre çiroknivîsê me rola serkêşiya gundiyan daye dest wî, û gundî jî li dû wî diçin, û gotinên wî bi cih tînin, û erzan nakin.

Soro li destpêkê bi wêneyekî şoreşgerî tê xuyakirin, şiyar e, zana ye, dost û dijminan baş ji hevdu vediqetînin. Cihê xebata cotkar û gelê Kurd naskirî, tili ya xwe bi hêz daye ser derdê wan, û dijminê xwe baş sînokirî. Lê mixabin ta dawî ya çîrokê bi vî awayî berdeyam nake.

Gundiyan ber ve hev tîne; ango yekîtiyekê di navbera wan de ava dike. Hêrsê wan bilind û tûj dike. Piştî vê gavê dandina diravan (bertîl) pêşniyar dike.

Li vir zanîn û şiyarî û xebata Soro bi rûyekî êdyal (çêkirinî, îslahî) diyar dibin, û bi çundina ba bervedêr re nêrîna wî ya çêkirinî zelal xuya dibe, heya ku ew navê şoreşgerî jî ti çareyan li wî nake, û li bejn û hiş û ramana wî fireh xuya dibe, û wî jî tuxûbân nêrîneke çêkirinî bi dîr naxe.

Livandin û hejandina Soro di çîroka (Reşowê Darî) de, bi vî awayî, dide xuyakirin ku helwestên Cegerxwîn di tenga sergêra Kurd û rizgariya çîna jêr re, di vê çîrokê de helwestine êdyalin.

- **Mirovên dîtir** : **Bizdo, Hovo, Lalo, Çekûso, Şêro, Perîşan, û Silo.**

Hebûna wan di çîrokê de tenê ji bo ku çiroknivîs hebûna beşekî nezan ji çîna jêr wênebikira, û şiyarkirina wan bide ser milên kesên zana.

- **Bervedêr, fermandar û dozdar** : Birêveçûna bûyerên çîrokê li gor helwestên çiroknivîs yên êdyal, ew neçareyî hebûna van kesan kir. Lewre rola wan di çîrokê de bê biha dimîne.

Li dawî yê, û li gor livandin û hejandina kesên çîrokê, em dikarin bibêjin çiroknivîsê me nikaribû lêker û kirarên xwe bi hev re bajotana, nikaribû kesên çîrokê hêja û durust, di gel bûyerên wê bilivandana. Ma çîma Lewend wê nereve, lê wê bê kuştin? Ma çîma Reşo wê di vê rewş û pergalê de bi rewşa kurd û cîhanê

mijûl bibe, ne bi ya xwe?. Ma çima civat wê li goristanê behsa Seydayê Xanî bike? (Rûpel, 50). Ma çima kesên tirsonek û pişgiriya Reşo nekirine, wê bêne girtin, û bikevin bin lêdanê?. Ma çima Zoro wê wan ji xwer re bike dijmin, tevî ku dizane dostaniya wan îro ji bo wî kêrhatiyê?. Ma çima cendirme wê hin gundiyan li gund berdin û hinekan bi rê de berdin?..

Bersivên van pirsan di çîroka (Reşowê Darî) de nînin. Ev yeka jî dide xuyakirin ku Cegerxwîn nikaribû bersiva pirsra çaran (çima bûyer wilo bû) dida. Lewre yekîtiya bûyer, di vê çîrokê de, tewaw nebûye. Ev kêmasiya jî (Reşowê Darî) ji nûçekê ve nêzik dike, û ji çîrokeke hunerî ve bi dût dixe.

### 3- Wate :

Birêveçûna lêkeran ji destpêkê ta navîn û dawî yê bûyerkî serbixwe berçav dike, ji ber ku bûyer bi xwe wênekêşiya kesekî ye ku di nava karekî xwedî wate de ye, û bi carekê ne raste ku nivîskar bergehêkê bixe navbera bûyer û wate yê. Ev her du (bûyer û wate) li gel hev girêdayînin, çimkê bûyer bê wate nabe, û her sê hêmanên bûyer (lêker, kirar, wate) li gel hev girêdayînin, eger lêker û kirar bê wate bin, ewana bê nirx jî dimînin.

Çiqas nivîskarek karib e kesên çîroka xwe xwaşik çêke, û lêkeran paqij û zelal pêşkêş bike, eger ew lêkeran bê wate bin, bi rastî, avakirina wê çîrokê wê ne li hev be, û Formê wê, yê hunerî, wê lerezandî bimîn e. Ev yeka dide xuya kirin ku wate hêmanekî biha û girînge, ji hêmanên bûyer, bi carekê jê bi dût nakeve. Lewre karê lêker û kiraran ewe ku berdestiya wate yê bikin, eger vî karê han nekin, bê guman wate wê, di çîrokê de, mîna pînekî reş li ser cawekî sipî bête xuyakirin; ango bergehêk wê bikeve navbera wateyê û lêker û kiraran, hîngê durvê çîrokê wê jihevketî bimîn e.

Ma gelo lêker û kirarên çîroka (Reşowê Darî) bûbûn berdestên wate ya wê, yan na?..

Li destpêkê civata gundiyan li eywana Zoro Axa saz dibe, ev yeka jî nade xuya kirin ku dijîtiya di navbera wî û gundiyan de heye, eger habûwa, wê civata xwe li mala gundiyeke li darnana • Dema Lewend li dor namûsa Reşo digere, ne xuya ye wê bête kuştin, lê numaye wê karibe namûsa wî birîn bike, û birev e, çimkê Rewşê li malê bi tenha xwe ye, û kesek nîne ku arî wê bike.. Beşek ji gundiyan arî Reşo nakin, û ji Zoro Axa re diyar dikin ku ewana bi serê xwe nin, ev jî perçebûna wan ji hev eşkere dike, û girtina wan û ketina bin lêdanê di cih de nabîn e. Beşek ji gundiyan ku hatine girtin diravan nadin Zoro û cendirman da xwe rizgarbikin, ev jî nade xuyakirin ku wê bi rê de diravan bidin, û tenê Reşo û Rewşê di destên cendirman de bihêlin.. Soro bi zanîn li sergêra Reşo û Rewşê dinêre, û şanî me dike ku dijminê xwe baş naskirî, û hêvî ya me di xwe bilind dike, ku wê gundiyan bikşîne ser şerê dijmin û riya rizgariyê, lê mixabin ew wê hêvî yê pûç dike, nemaze gava pêşniyar dike ku her yek diravan peydabike da bidin cendirman, û gava bervê xwe dide ba bervedêr.. çîroknivîs gundiyan şanî me dike, ku ji hev



pirçiqîne, ev yeka jî nade xuyakirin ku wê zû-zû hevgiredanekê di navbera xwe de peyda bikin, û bê şer wê Zoro Axa ji gund bi derkin.. Hevalbendên Zoro Axa (Sîmbola qata jor) gelekin, wek mela, beg, derebegên kurd û tirk, ev jî nade xuyakirin ku wê bê şer ala revê hilde, û dest ji gund berde.. Ciwan; bervedêrê rewşenbîr û zana, dizane ev dadgeha ku lê didêre ne ya rêzaniyê ye, û dizane çarelêkirina doza kurdî di destên fermandarê wê dadgehê de nîne, ev yeka jî nade xuyakirin ku wê di dêreka xwe de vê dozê bîne zimên, û çareyan ji fermandarê û dozdarê bixwaze.

Bi vî awayî, zelal û servekirî, ji me re diyar dibe çawa gelek lêkerên kirarên çîroka (Reşowê Darî) ji wate ya bûyerên wê ve dûrin, û berdestiya wan nakin. Lewre em dikarin careke dîtir bibêjin yekîti ya bûyer di vê çîrokê de ji hevkeftî xuya dibe.

#### 4- Dawî ya çîrokê (gaveka ronîkirinê) :

Giringiya dawiyê di her çîrokekê de gelekî nirxbihaye, ji ber ku hemû dezîyên bûyer tê de dicivin û dighên hev, û wateya bûyer a ku çîroknivîs ji bo diyarkirina wê dixebite, tê de numa dibe. Lewre rexnevan û lêgervan vê dawiyê bi (gaveka ronîkirinê) nav dikin.

Gaveka ronîkirinê di çîroka (Reşowê Darî) de çawa xuya dibe?

Bi rastî eger em li çîrokê, bi 83 rûpelên wê vegerin. em dikarin bibêjin ev dawîya ku hemû dezî û hêmanên bûyer tê de dicivin û wate ya bûyer bi serî tînin, di çîroka (Reşowê Darî) de nîne, ji ber ku birêvebirina bûyerê çîrokê, bi carekê, nade xuyakirin ku Zoro Axa wê bê şer ji gund barke û bireve, û ne jî pêjna raxistina doza kurdî, ya netewî û rêzanî, li dadgehê jê tê.

Lê gava em bawer bikin ku çîrok bê dawî nabe, û gaveka ronîkirinê jê re pêwîste, em dikarin bibêjin çîroka (Reşowê Darî) li rûpelê şêstî, bi gotina Soro tewaw dibe. Guhdarî wî bike, dibêje : **“Heke bi a min dikin emê bêşekê bavêjin ser hevala, heme her yek karibin çî bidin, û hin ji hevala ku nikarin xwe li ber dara bigrin, bere birevin, xwe bidin alîkî, wê paşê bi kêrî me bin, evê dî ne mêra bikujin, û ne li cendirman xin, û ne jî kesî talan bikin, emê çendeka ji xwe vebêrin, bişnin bajêr, bere ew jî gilî bikin, bervedêrekî bigrin, bawer dikim emê zora Zoro bibin”**. (Rûpel : 60).

Birêvebirina lêker û kirarên çîrokê bi wî awayê ku me berê dabû xuyakirin, nemaze jî birêveçûna Soro ya êdyal dibe sedemeke giring, û me ber vê baweriyê dikşîne.

Piştî vê rawestina me, li rex avakirina vê çîrokê, divê em li nik tevna wê jî rawestin, da durvê wê ji me re baş diyar bibe. Ev yeka barê rûpelên pêşîne.

#### *Dûmahîk heye*

# Derbdayîn di Zimanê Kurdî de

Rêziman ne tenê rêzikên darijtina bêjeyan, rastnivîsandin, tewandin û bilêvkirina tîpan e. Bilêvkirina bêjeyan ya durust jî di rêzîmên de zor û zor giring e. Çunku, gelek bêje hene ku di warê nivîsandinê de weke hev in; hevtîp in, lê wateyên wan jî hev cihê ne; ne weke hev in. Ev cihêbûn û newekhevî di saya bilêvkirina durust de diyar dibe. Her wekî:

Cotkarî .....	حرثة، زراعة
Cotkarî .....	مزارع
Fedokî .....	الخجل
Fedokî .....	خجول

Lewre, hin rêzik jî bilêvkirina durust re, di rêzîmana Kurdî de, hene: Di bilêvkirina hemû bêjeyan de dergav kîtek bi derb û sertî tê bilêvkirin. Vêca ev rêzik ewê kîte bi me didin naskirin. Ji wê derb û sertiyê re (Derbdayîn)<sup>1</sup> tê gotin û ji wê kîte re (kîta derbdayînê) dibêjin. Ew kîta derbê li ser dengdêrê xwe werdigre. Ango, dengdêr di kîta derbdayînê de sert û giran dibe.

Derbdayîn jî bo rastxwendin û bilêvkirina durust zor pêwîste.

## Ciyê derbdayînê:

### I- Bêjeyên Salt:

Bêjeyên salt yên yekîte hergav bi derbdayînê ve tînan bilêvkirin, lê bêjeyên salt yên pirkîte, çi yên xwerû û çi yên hevedudanî, bi gelemperî, derbdayînê li ser kîta dawiyê werdigrin. Nimûne :

Dermān	Tirsonēk
Perdē	Dergevanî
Kuştî	Gotin
Darîstān	Havîngēh
Kurik	Keçîk
Mezinahî	Mêranî

<sup>1</sup> Ev binavkirina Prof. Dr. Qenatê Kurdo ye.

Eşkere û xuya ye ku derbdayîn dengdêr sert dike; giran dike, lê tu caran wî dirêjtir nake.

Hin bêje hene ji rêzê der in; derbdayîne li ser kîta berî dawiyê werdigrin. Ew bêje jî ev in:

a- Bêjeyên hevedudanî, yên ku paşpirtika (IK) di wan de heye, û ji sê kîtan yan pirtir hevedudanî ne:

Gurçîlik	Darkûtik
Têşîrêsik	Sorevêrik
Zengelorik	Bilbilitanik

b- Bêjeyên hevedudanî, yên ku paşpirtika (Î) di wan de heye, û ji sê kîtan, yan pirtir hevedu-danîne, û wateya wan ne razber (abstraktî) e:

Bajârî	Mêrsînî
Kenokî	Fedokî
Destarhêrdî	Cotkârî

## II)- Bêjeyên ku veqetandek yan pirtikên nependiyê wergirtine:

Veqetandek û pirtikên nependiyê ciyê derbdayîne naguhêrin. Nimûne :

Dermān + ê	Dermānê wî
Dermān + ek	Dermānek
Dermān + in	Dermānin
Perdē + ek	Perdāk
Perdē + a	Perdā min

## III)- Bêjeyên ku hatine tewandin:

Di bêjeyên pirkîte de tewang ciyê derbdayîne naguhêre. Nimûne:

Mehîm	Mehîne, mehînan
Masê	Masê, masan
	Masêye, masêyan

Lê di bêjeyên yekîte de, û di rewşên jêrîn de, tewang ciyê derbdayîne diguhêre û dibe ser xwe:

a- Gavê bêje ji dengdêr û dengdarekî be:

Ēw	Ewî, ewê, ewan
Āv	Avê, avan

b- Gavê bêje ji dengdêr û dengdarek li pêş û yek jî li paşiyê avakirî be:

Dār	Darê, darān
Dōt	Dotê, dotān

c- Gavê bêje ji dengdêrekî, dengdarek li pêş û du dengdar li paşiyê avakirî be:

Dēst	Destî, destān
Hēsp	Hespî, hespān





## Nezîr Palo û “Qêrîn”a wî

-Helbest li nik Nezîr lêkerêkî hêzdar e, dikar e zulm û zorê ji damaran de hilke.

Tevî ku torevanê Kurd her di bin çavdêriya rejîmê de ye, lê ji a xwe namîne, û ber pirsyariya xwe li hember eş û jan û hêviyên-gelê xwe destan jê bernade, her û her xwe ciyê pirsê dibîn e, û çendî karmendiya miletê xwe bike, tim û tim xwe dendarê wî miletî dibîn e, nemaze ji gava ew mileta ji xwendin, dibistan û pirtûkan bê par be, wê hingê nivîskar û milet, her du jî, bandûr û rola nivîkar baş nasdikin, lê serdestên rejîmê wê rolê baştir nasdikin, û şerê nivîsevan, bi her awakî dikin, çi êşkere, û çi ji bi dizî û sergirtî.

Nivîsevanê Kurd gelekî berxwe dide, û li hember helwestên rejîmên serdest, ku dixwazin bi hezarê şêwan wî pûç û şel bikin, bi mêranî radiweste, û serê xwe natewîn e. Ji ber vê helwestê pirçar, ji neçare, dide ser rîya mişextiyê.

Nezîr Palo yekeke ji wan nivîsevanan, neçereyî mişextiyê bûye. Nezîr helbestvanekî Kurdên Sûriyê ye, li destpêkê, di hin şevbuhêrkên toreyî, helbestî de diyar bû, û helbestên xwe xwendin, di dû re berhevokek helbestî, bin sernavê (Qêrîn) de, sala 1997 an çapkir. 44 helbestên wî di vê berhevokê de, li ser 112 rûpelên qulafet - navîn hatine raxistin, û hest û jan û kovanên wî werdigerfîn.

Ne ji li hevhatinekê bû ku Nezîr deriyê helbestê lêda, lê ew lêdan helwestek bû, wî pê bawer kirî. Helbest li nik Nezîr lêkerêkî hêzdar e, ku dikare zulm û zorê, ne tenê bihejîne, lê dikare wan ji damaran de hilke, û bavêje nav qerêjiya dîrokê. Ji ber vê yekê Nezîr di pêşgotina berhevoka xwe de dibêje : **“Helbest pîrsk mezine, di jîyanê de, şîn û evînê di veşaran de vedikolîne, û bi hêz kilîtê dergêhên saw û tîrsê dişkin e”**.

Mirov ji van gotinan têdigîne, ku Nezîr helwesteke mirovatî heye, şer û cengê li dij her tişt û lêkerên qerêj û nemirovperest dajo. Lewre dibêje : **“Helbesta**

şoreşgeriyê / çiqas bi xwînê / Hatiye stirandin / û hîn jî / ji serê çijan / daneketiye". (Rûpel : 17).

Nezîr Palo, bi vî wêneyê helbestî, jiyana û xebata gelê Kurd pêşkêş dike, ew jî wêneyekî rasteqîne, ji rastiya wê jiyane hatiye birin, çimkê şerê azadixwaziya Kurd ta roja îro li ser û tepela çijan tê ajotin û domandin.

Ev wêne du nameyan ji xwener re rêdike; yek ji wan, wek me gotibû, rastiya xebata Kurd e, û ya dîtir jî rexneye. Tê xuyakirin ku Nezîr nêrîneke taybet heye, dixwaze bibêje çiqas ew xebata ku li tepela çijan tê ajotin gurr û hêzdar be jî, her û her ew hewcedara xebateke dîtir e, ku li deşt û bajar û gundan divê bête ajotin, ji ber ku her du cureyên xebatê hevudu tewaw dikin, ger xebata serê çijan çekdarî ye, ya deştan û bajaran jî gereke rewşevbîrî be, Ango miletê nezan nikare xebata çekdarî av bide û bidomîn e. Ji ber vê yekê helbesta Nezîr li ber serê wî gêj dikeve: "Helbesta min / her şev / di guhê min de / dinal e / û bi sibeyan re / li ber serê min / gêj dikeve". (Rûpel : 8).

Bi rastî Nezîr, li vir, sergêreke mizin dilivîn e, ew jî segêra hevghîştinê ye. Piraniya miletê Kurd xwendinê bi zimanê dayik nizanin, û hinek ji yên dizanin bixwînin ji helbestê ténagînin, ji ber vê yekê, bandûra helbestê, ne tenê tê şînkirin, lê pûç jî dibe, çimkê gava peyv guhên guhdaran nebîne, hîngê peyv ber ba dibe, û di bêdengiya aso de wenda dibe.

- Gava peyv guhên guhdaran nebîn e, hîngê ber ba dibe, û di bêdengiya aso de wenda dibe.

Ji ber vê sergêrê, her helbesvanekî Kurd xwe li hember vê çate - rêkê dibîn e; ka bi çi şeweyî wê li gel milet baxife ?!. Bi çi şeweyî wê ji gel re bînivîsîn e ?!. Bi zimanê ku milet tédigîn e, an bi zimanekî toreyî, hunerî û helbestî ?!. Ev çate - rêk, ta îro, bûye sedemek ji sedemên şûndamayîna helbesta Kurdî. Ev kendal wê neyê derbazkirin ta ku cîgehê helbestvan û rewşenbîran li ba hemû kesan, nemaze jî li ba helbestvanan bi xwe nasnebe, û ta ku qêrîna Cegerxwîn "ger xwendin nebê, kes naçe pêş". di guhan de her zindî nemîn e.

Helbestên Nezîr ne tenê vê sergêra me nîşankirî dilivînin, lê hinên dîtir berçav dikin, û tékiliyên civakî ji xwe re dikin mijar, lê di navbera nêrîneke gelemper re wan tékiliyan, nemaze jî evîn ê, pêşkêş dikin. Nezîr di helbestekê de dibêje : "Li her warekî / di asîman de / di derya de / li rêkan / li her cîwarekî / ez li evînê / geriyam / li dawiyê, / piştî ku bê hêz mam / min zanî ku / evîn ... / di sîtava bijangên welat de / raketiya". (Rûpel : 11-12).

Evîn pêwendiyê mirovatiye, dilê du mirovan (jin û mêr) li gel hevudu dibestîne, û tékiliyêke civakî ye jî, mirovan ber hevudu dikşîne, lê Nezîr nêrîneke taybet li evê pêwendiyê û tékiliyê heye. Heya ku evîn têkeve hindir çarçeweke mirovatî divê pêjna welêt jê were, divê li gel cîgehê bête bestandin, lewre jî helbestvanê me li her derekê geriya, û dawî jî evîn li bin mijangên welêt de dît.

Ango evîna ku lê digere û dipelîn e ne yekeke xudî çêjneke êdyal e (mîsali), ku li ezmanan tê dîtîn, an di pirtûkan de tê pelandin, ne jî yekeke sermeste, ku li ber peyalên meyê tê cûtîn û noşîn, lê yekeke ku taybetiyên welêt jê tîn wergerîtin, û bi rewşa welêt ve tê bestandin.

Ji ber vê yekê, gava gel û welat bindestbin, evîn jî, wek pêwendiyê mirovati, hêla wê ya giyanî tenik û qels dibe.

**“Roja me ji lêvên hev mey noşand / ji wê rojê de / çîroka tîbûnê / li ser lêvên min / serxoş katiye”. (Rûpel :87).** û wek tîkiliyê civakî, birîndar û bindest dimîn e. **“Roja destê min di destê te de / mijûl bû ... / û ji tiliyên me heyranok darivîyan / ji wê rojê de / xemkêşiya Memê Alan / di dilê min de dijî / û di çavên demê de agirê evînê gur dibe”. (Rûpel : 86).**

Evîn, li nîk Nezîr, û di tenga nêrîna wî, ya taybet re, dibe lêkerekî guhertinê, dikare tiştên heyî biguhêre, dikare zulm û zorê bişkîne, dikare şînan biguvêşe û şahiyên jê bidoşe, dikare rewşa tehl û tîrş serûbin hev bike, û ala azdiyê û serkeftinê bilind daleqîne. Lewre jî bang dike û dibêje : **“De were .. !! / em kevneşîna / ku di canê me de asê bû ye / tazfîkin û ahenga / ku di xwîna me de şikestiyê / hişyarkin / ta ku bi kenê gupikan / em sibeyên dîl / di çavên hev de rizgarkin”. (Rûpel : 76-77).**

Evînek ji vî cureyî, ku dibe lêkerekî guhertinê, dikare pirsên mezin di derûn û giyana zarokan de jî bilivîn e, û wan bi ber hişyarîke, beriya dema xwe de, bikşîn e. Ji xwe em Kurd tim û tim sotandina qonaxan ji me re divê û pêwîste, ji ber vê yekê jî, eger zarokên me pirsên mezin bipirsin, ev gav, tiştêkî normal tê xuyakirin, vê ca dehsaliya “Siwar”; kurikê Nezîr, kend û bendan ji hev dixin, û vê pîrsa, ku ji wan salan mezintir pîrsdikin :

**“Bavo / çîma em zarok / bi zimanê xwe naxwînin û nanivîsîn?! / û sirûdan / bi zimanê Kurdî nabêjin ?! / çîma mamosteyên me / bi Kurdî napeyivin?!. (Rûpel : 54-55).**

Lê dehsalên Siwarê biçûk nikarin bersivê bidin, ji wan ve xuyaye, ku jiyan tev şahî ye, evîn e, bazdan û stiran e, ken û dilan e. Ma çî dizanin ku mirov hene zimanê mirovan qedexê dikin?!. Ma çî dizanin ku mirov hen e, heyîna mirovan tune dikin?!. Lê Nezîr jî bêdeng dimîn e, bersiva pîrsan nad e, **“pîrsên Siwar canê min di sotînin / û ez bêdeng dimînim”. (Rûpel : 55).**

Ev bêdengiya helbestvanê me gunehkarîke mezin dide ser milên ewan kesên, ku di hindîrên malên xwe de nikarin, an jî naxwazin bi mendalên xwe bidin zanîn, ku ew jî xudî zimanî, xudî kelepur û hebûneke taybetin.



Bi rastî ev bêdengiya helbestvanê me bangeke, cihê xwe di guhan de dipelîn e, û nesaxiyeke civakî û heyînî berz û tazî dike. Gelek malbatên Kurd henin, zimanê axiftinê di malên wan de ne Kurdî ye, ev yeka helbestvanê me dêşîn e, ji ber ku bandûra wê li millet, nemazê li mendalan, gelekî kûr û qerêje, çimkê ev gava ne berpirsiyar dûrbûnekê dixê navbera mendalê Kurd û kesîtiya milletê wî, û hin bi hin ev gav wê wî ji kesîtiya millet hilke. Eger mirov zanibe ku mendalên miletan rûyê diwaroja wan miletanin, wê zanibe ev karê ne berpirsiyar çiqas bandûrekê qerêj li miletan heye..! Ji ber vî nirxbihayê mendalan, helbestvanê me dibêje : **"Min li çavên zarokan nihêrî / min dît / welat tê de bûye bazekî bi ber firê ketiye"**. (Rûpel : 98).

Nezîr Palo, di vê berhevoka helbestî de, tiliya xwe dide ser gelek nesaxiyan, û hewlîde ku karibe nêrfneke taybet pêşkêş bike, û wê nêrinê li durveki helbestî nû siwar bike, lewre hemû helbestên wî serbestin, û li dû şopa nûjeniyê dibezin. Lê mixabin ji wê de dûr dimînin, û didine xuyakirin hê bergehê li pêş wan heye ta ku bighînin nûjeniyê.

**-Gava gel û welat bindest bin,  
evîn jî, wek pêwendiyê mirovatî,  
hêla wê ya giyanî tenik û qels dibe,  
û wek têkiliyê civakî, birîndar û  
bindest dimîn e.**

Nûjenî, beriya her tiştî, hemdemî ye, helbestvanê nû di çerxa xwe de dijî, li gel sergêr û ramanên çerxa xwe dijî, lê belê ne rihet e, ne raziye, rewşa wî rewşeke bê tebate, şahî li nik wî kême, hesta wî tirajîdî ye, helbestên wî her û her guhertinê ji xwe re dikin armanc.

Nûjenî, di helbestê de, nêrfneke qeşengî taybetî ye, her û her li durv û şêwe, û rêgayên hunerî nû digere, û wêne û sîmbol û efsaneyan ji bo derbirinê dike alav, û hewlîde ku helbestê li ser avahiyeke nû, bi zimanekî nû, ava bike.

Gava mirov helbestên Nezîr dixwî e, hestekî bê tebat di wan de dibîne, ev yeka jî belkî ji xurista jiyana Kurdî hatibe, ji ber ku ew, bi xwe, jiyaneke bê tebate. Mirovê Kurd, ji demên dûr û dirêj de, bi bêtebatiyê hatiye pêçandin, diwaroja wî, ta roja îro, ne sayî ye. Nezîr jî yekeke ji vî gelê bextreş, ku ev rewşa ne lihev wî jî dicû û dihêre, lewre Nezîr dibêje : **"Di ferhenga jiyânê de / ez ji bîr bûm e"**. (Rûpel : 10). Bi vî awayî kirasek tirajîdî bi ser wê bêtebatiyê de tê berdan, û mirovê Kurd umîda xwe ji hemû dostan dibirre, ji ber ku ew ji bîr dibe, û xwenên wî beravêtî dibin **"Xewnên min / bi sibeyê re berdavên"**. (Rûpel : 16).

Nezîr bizavdike, ku karibe, wek helbestvanên nûjen, wêneyên hunerî di dest xwe de bike alavên derbirinê, lewre gelek wêneyên helbestî pêşkêş dike, lê ew wêneyan dilên kevneşopiyê dimîn in, û didine xuyakirin ku helbestvanê me nikare zû - zû xwe ji bandûra kilasîkî rizgar bike. Eger mirov li nik helbesta **"E'frîn"** raweste, pê re mijûl bibe, wê bi hêsanî karibe wêneyên helbestî, ku li nik Nezîr xuya dibin vegeşîne bingehine kevneşopî. **"Li bin dareke zeytûnê / xemla bûkaniyê / bi ser xwe de berdayî .. / û porê xwe bi lêlava çiyayê şedike .. / Bi keskesorê çekiya xwe girêdide / û bi dengê zelal / dilêşiya xwe / di guhên evîndaran de dixwî e"**. (Rûpel : 28).



Ev her sê wêne (Xemla bûkaniyê, porê xwe şedike, çekiya xwe girê dide". ji xemil û xêzên E'frînê hatine wergirtin, û damarên wan di folkilora E'frînê de kûrin. Ev wêneyan bergehên di navbera Nezîr û jiyana gelê wî de tune dikin, lê nikarin bibine hinekin nûjen.

Hêmanên ku wêneyên hunerî jê peydadibin, li nik Nezîr, gelekî ji hev du de nêzîkin, ta ku mirov sînoran di navbera wan de nabîne, ji ber vê yekê jî wêneyên helbestî, li nik Nezîr, normal in, ne matmayî nin. "**Dema min tu dît / min dest ji gul û nêrgizan berdan / û di bajarê çavên te de / windabûm**". (Rûpel : 30).

Ev her du peyvên (bajarê çavên te) nikarin vî wêneyî bikin yekekî nûjen, ji ber ku li kêleka wan (gul û nêrgiz) bi wan de hatine daleqandin, û wan bi ber normaliyê de dîkşî in, û hêmanê matbûnê di wan de diçelmisîn in. Ji bo vê yekê hêmanê pêjnê (يحن) di wan wêneyan de çels dibe, ta ku gelek wêneyên helbestî, li nik Nezîr bê p'jn dimînin. Lê belê hin caran filaşine berz li nik Nezîr pêdikevin, pêjna helbestvanekî sozdar ji wan tê. "**şev di lingên me de teng dibe**". (Rûpel : 65). "**Ta ku sirûdên pesnê / di birîna lêvên tirsê de ditevizin .. / û kêrê daholan rêkên vegeê talan dike**". (Rûpel : 66).

**Nûjenî, di helbestê de,  
nêrîneke qeşengî taybetî ye,  
her û her li durv û şêwe û  
rêgayên hunerî nû digere.**

Lê belê evan filaşên berz û sozdar nikaribûn avahiya helbestên Nezîr bikirana avahiyeke nû, ji ber ku avahiya wan helbestan yekeke vekirî ye, mirov dikare li wan zêdebûnê bike, yan jî tiştêkî ji wan kêr bike. Ev yeka nebûna durvê biyoloçî, di wan helbestan de, teqez dike, helbesta nûjen jî hebûna vî cure - durvê hunerî pêwîst û diva dibîne, ji ber ku evê cure - helbestê yekîtiye biyoloçî heye, ango helbesta nûjen wek gewdeyekî zindî ye, ji gelek hêmanên ji hevdu cuda peyda dibe, û tê avakirin, û ew hêmanên cuda-cuda hevdu tewadikin, çimkê gewde jî gelek hêmanên cuda henin, û her yek ji wan karmendiyeye cuda dike, lê ewana û karmendiyên wan tev li gel hevdu jiyana gewde diparêzin.

Ji vê pê ve zimanê helbestên Nezîr ne li tek astayekî xuya dibe, carina tu dibînî ziman li nik wî gelekî nerme, mîna axiftineke rojane xuya dibe. "**Roja .. / awirên min sînora çavên te / derbaskirin / û di kûranîyê de raz çinîn.. / ji wê rojê de / axinên min bûne tîp / û di helbesteke ji hev kefî de / disotin**". (Rûpel : 85).

Lê hin carên dîtir zimanê helbestê hişk û sert dibe, ta ku tîji qêrîn û hawar dibe, û dighe sînorê axiftineke yekser, û helbestiya helbestê birin dike. "**Gotinên helbestên min biçine.. / û tîpan ji hev bike / tiştên di dil û hişê min de bibîn e.. / û li dawiyê / min tev helbestan bişewtîn e**". (Rûpel : 89).

Ev her çar lêkerên fermanî (biçine, ji hev bike, bibîne, bişewtîne) tevgerê di helbestê de tune dikin, û wê dixin çarçewa helbesteke hînkirinê, ne çarçewa yekeke hunerî, ji ber vê yekê jî tê xuyakirin ku Nezîr Palo hê ji dav û torên kevneşopiyê rizgar nebû ye.

Lê em bawerin ku ev berhevoka yekem wê karibe bibe gaveke bi nişan di rêveçûn Nezîr ya hunerî de, û jiyana mişextiyê û dûrbûna ji welêt wê karibe karînen hunerî ku hê di hindirê Nezîr de mane, biteqîn e.

**Li** Oslo Paytexta Nerwêc, helbestvan, nivîskar û pêşmergeyê Barzanîyê nemîr (Sebrî Botanî; Sebrî yê Ehmê Temir), di roja yekşembê de 25. 10. 1998, çû ber dilovaniya xwedê.

Bi koçkirina wî, stêrek geş û çirîsî li asmanê Kurdistanê rîjîya. Belê gelek stêrên bi ronahî li paş xwe vêxistî hiştin.

Bi ragihandina peyama koçkirina wî, evîndarên gotinên wî, ev peyama bi xem û dilekî şikestî pejirandin. Nemaze , ewên ku helbestên wî bi dengê rehmetî M. Şêxo , an Ciwan Haco an Izedîn Temo guhdarî dikim, wek vê helbesta ku M. Şêxo distira :

**Ez bûme pîrê xemcivîn  
Mest û bê hest jêr nivîn  
Evîna wê ez pîrkirim  
Yekcar bê huş û bîrkirim  
Li dil vabûne sed birîn  
Ji derdê wê gula şêrîn**

An eva ku Izedîn Temo distira :

**Dildarim , dilbirînim  
Ne şaşim ez ne dînim  
Ez nexweşê evînim**

Wek ku diyare, mam Sebrî Botanî dihat hejmartin yek ji pêşmergeyên Barzanîyê nemir. Ew Barzanîyê ku mafê Kurdan jêre wek nan û avê bû, Sebrî Botanî jî, di wê dibistanê de mezin bû, fêrbû û dara wî bi giyanekî Kurdperwerî hat avdan. Vêca her dem û gav hêvî û armancên wî , yekîti û serxwebûna gelê Kurd



bû, û ev yek xweş belûye di helbesteke wî de bi navê “Zengilê Min”, ev helbest Ciwan Haco kiriye stranek:

**Zingezinga zengilê min, Vaye dîsa deng veda  
Dengê doza milletê min, dinya girt û berneda**

**Zingezinga zengilê min, xweş hawar û gaziye  
Awaza vî zengilê min, ji ferhenga Qaziye**

**Her wekû bir.û birûskî, xwe gîhand şerxa felek  
Sed xweşî bo vî dilê min, ku min dî Kurd bûne yek**

Mîrov dikare bibêje ku gelek ji hunermendên gelê Kurd, kodên tembûra xwe bi helbestên mam Sebrî Botanî xemilandine û bi belavbûna stranên wan di nav gelê Kurd de evîndarên wî pîrbûne, nemaze di nav evîndar û dildaran de, û vê yekê hişt ku gelê Kurd peyama koçkirina wî bi xem û keser û şîn qebûl bike û gelekî li ber oxirkirina wî keve.

### **Jînenîgariya Sebrî Botanî :**

Sebrî Botanî; Botîye ji hoza Jêliya ye.

Di sala 1925 an de ji dê û bavê re çêbûye, li gondê “Lûdê” navça (Eroh : Dihê), girêdaya bajarê “Sêrtê”, li Kurdistana bakur.

Li ser destê diya xwe bû, dema ku tirkan Şêx Seidê Pîran û hevalên wî li Amedê bi darvekirin. Vêca di sala 1929 an de, ji ber tirs, zilm û zora tirkan, bavê wî “Ehmê Temir” mala xwe bi dûv mala Resûl axa Mihema û birayê wî Egît axa serokê hoza Jêliyên Botan barkir binya xetê - Suriyê - navcê Eyndîwerê.

Hingê Dêrika Hemko, wek bajar tune bû, Eyndîwerê, bajar bû misteşarê Fransî lê rûdinişt.

Di sala 1936 an de, diya wî ya oldar û ji xwedê bi tirs, kurê xwe Sebrî dibe bal melayê gundê “Sêgirka” yê mala Mîro (Niha ev gund tune ye). Sebriyê Zîrek, di demeke kurt de Qurana pîroz nêvcî dîke, lê ji ber tirs û xwestekên mele zû dev ji xwendina Olîtiyê berdide û berê xwe berdide xwendina fermî li Eyndîwerê, li ser vê yekê di pêşgotina “Dilistanê” de weha dibêje :

“...Li hezar û nehsed û sîh û şeş, bibûm mîna gulek geş, dayka mîna misilman, aşiqa dîn û îman, ez birim ber xwendinê ji bo karê dîn û dinê .... Ez rêkirim “Sêgirka” paytextê mar û mişka, Mala Mîro avabû. Mîro rewşa mêra bû, nimûneyê camêra bû... Seydayê xwedê kurtî, kar bazbend û nivîştî, aşiq mirîşk û qirûş, dem û gavê şerfiroş. Hema bi nav mela bû, rastî derd û bela bû. çav li hêk û sabûnê, heta roja rabûnê. Dersên tirsê digotin, bê agir em di sotin. Ewê xwedê nehiştî, darfeleqe li destî, her hejand û rahejand, heta jêhat veweşand, patik li min herişand, dilê min pê lerizand. Wî dil bi kes nedisot,

dar rakir û hat û got : “Hey kurê wî seyê piş, kê dît mizgeft û nivîs ? nivîs ne karê meye, diyanet yarê meye. Tu hatî nivê Quranê, pa xelatê min kanî ?”

Û weha Sebrî Botanî xwendina Olîtiyê li paş xwe dihêle û berê xwe dide xwendina fermî li Eyndîwerê, di gel kurên mala Mîro dixwîne, ta ku digihêje rêza çaran.

Ji ber gelek sedemên çetfn dev ji wê jî berdide. Di vê warî de weha dibêje :

“...Ez gîham rêza çarê, ne xwezî min bi wê biharê. Min xwendina xwe hêla, ji nû ketim ber pêla. Bê çare û derbider, derdê welat hate ser.

Ji eşqa welatxanê, min xwe berda meydane ...”

Sebrî Botanî, biçûkanî û xortaniya xwe li Suriyê, navça Eyndîwarê û Dêrîkê derbaskir, û di wan salan de çav bi gelek welatparêzên kurdan ket, nemaze ewên ku di civata “Xoybûnê” de bûn, hem jî xwendevanên kovara “Hawarê” bûn, wek: Resûl axa, Egît axa, Abdulkerîmê Mele Sadiq, Haco axa û kurên wî, Hemze Begê Mîksî, yê ku wê hingê mamosta bû li Eyndîwerê, Dr. Ehmed Nazîf Zaza, yê ku wê hingê kilînkê li Eyndîwerê vekiribû, dibê jî ku çav bi mîr Celadet Bedirxan jî kiribe, dema ku Mîr bi serdanî diçû Cizîrê, û Cegerxwîn... ji xwe di bin hezkirina helbestên Cegerxwîn de, wî helbest hunandine. Di destpêkê de, wî piraniya helbestên Cegerxwîn ji berkiribûn. Ew helbestên ku di kovara Hawarê de dihatin weşandin.

Mîrov dikare bibêje ku Sebrî Botanî yeke ji şagirtên Cegerxwîn yên pêşîn, hem jî, mîrov dikare bibêje ku, bi saya kovara “Hawarê” giyanê niştimanperwerî, di huş û mejiyê wî de hat çandin. Di pêşgotina “şîn û şadî” de weha dibêje :

“... Kuro Sebro. Hê hê êdî piştî îro ez te nebûnim ha... Heke ezê lingê te bişkînim. Wey baboo tu dibêjî qey wî kafirê Cegerxwîn tîfkiriya devê wî da, wê roja hanê li ser berbanga mele Xelîlê Xello zirezira wî dihat û qîrkiribû : “Pîra Torê” û “Ey felek”.

Li Suriyê, Sebrî Botanî hez helbestan kiriye û dibe ku nivîsandibin jî. Bi texmîn ew di sala 1946 an de çûye Kurdistana başûr û di eynê salê de, li wîr hatiye girtin, hingê di zindana Mûsilê de helbest gotine û nivîsandine. Ew bi xwe vê yekê şirove dike û dibêje :

“... Ji sala 1944 ê ve, ez û şîi’r bi hev re dijîn, lê ji sala 1946 dê di zindana Mûsilê de jîna min di gel vehandinê dest pê diket, dost û hevalên min bi xwendina şîi’ran kêfxweş dibûn, lê ji nivîsîn û hilgirtina wan dilgiran dibûn...”

Temenê wî dor (20) saliye dema ku diçe Kurdistaba başûr, xuyaye li Zaxo akincê dibe û di sala 1957 an de dikanek wî li Zaxo heye “... Li sala 1957 ê ku dikandarbûm li Zaxo, ji nûjî :

Lezke bi lezîne ey qelem ...

Gelek borîne sal û dem ...

Ev jîna Tehîl û derd û xem ...

Li dil dijenin sed kelem ...

Derke dil jana sitem ...

Da vejînim gurzê Ristem ...”

Li başûrê Kurdistanê, dibe endamê P.D.K.I û wek kadirekî çeleng û jêhatî kar ji gelê Kurd re dike di gel hevalê xwe "Elî Esker".

Di sala 1961 ê de, beşdariyê di şoreşa êlûnê de dike, ta ku di sala 1967 an de li Kerkûkê tê girtin û pêlekê di zindana Mûsilê de dimîne, vê paşiyê bi alikariya hin hevalan ji zindanê direve û xwe bi serê çiyayên azad û hur ve digihîne ...

Rojekê ji rojan S. Botanî xwe ji ber şerê azadiya welat neda alî. Bê tirs di nav bazên serê çiyayên Kurdistanê de dijiya. Ta ku 11ê adarê 1970 î pêk hat. Hem jî beşdarî di şoreşa Gulanê - 1976 - de kir, û qet xwe ji rêçika Barzanîyê nemir neda alî...

Di sala 1991ê de, ji neçarî, di gel kerwanê penaberan çû Kurdistanê bakur - Silopî - û di sala 1992 an de wek penaberekî siyasî çû Ewropa, li Oslo paytextê Nerwêc bi çî bû.

Ne tenê Sebrî Botanî helbestvanekî zarxweş û helbestên wî nêzîkî dilê xelkên Kurd bû, belê hem jî ew wek rojnamevanekî jêhatî jî dihat dîtin û gelek rojname bi nivîsarên wî hatine xemilandin wek : Birayetî, Teaxî, Elîraq, Rewşenbîrê nû, û h.w.d. Hem jî bi navtêdana wî, gelekên ji dost û hevalên wî, dest bi hundandina helbestan kirin, wek ku çawa ew bi xwe bi navtêdana seydayê Enwerê Mayî li ser hunandina helbestan gur bû. Ji wan dostên wî : A, Rehman Mizûrî, Xelefê Zîbarî, Dr. Bedirxan Sindî... Hem jî gelekî hez hunermendên gelê Kurd dikir û nemerdiya helbestên xwe ji wan re nedikir, û ji ber vê yekê gelekên helbestên wî kirine stran û gotine ...

Dema ku gotin bê ser S. Botanî, nexasim jînenigariya wî, mirov nikare di ser hezkirina wî ji dengbêja kurd "Gulbiharê" re bi qevêze. Çiko, wî gelekî hezê kiriyê û gelek caran navê wê di helbestên xwe de gotiye.

Werin em bi hev re gotinên wî bixwînin, bê wî çî li ser Gulbiharê gotiye :

**"... Min Gulbiharê bi çav nediya, lê ji mêje ku ji dûr ve min naskirî. Naskirinek baş. Nivîsarên min ne ku hemû ji pesnê wê dagirtîne û bes. Belko hozan jî, ji zarê wê min vehîname û hem li ser wê jî nivîsîne. "Her perça tu dixwîni, bêhna gulê jê tê". Gula hunermend pencera min e. Ezgeşatî û spehîtiya hemû dol û nizar û çiyayên Kurdistanê rengîn tê ra dibînim..."**

Sebrî Botanî piraniya rojên jiyana xwe bi tirs û talî derbaskirin, gelek qiriktalî û dijwerî dîtin, ji roja çêbûnê li herêma Botan ta roja mirîna li Ewropa, dibe ku ew çend salên Ewropa xweşbûn, û bêhna wî hebekî hatibû ber, lê di baweriyê min, ji kalemêrekî wek wî re ne tu xweşbûn bû, dûrî xaka welat wek ku Kurd dibêjin "Xanîkê pîrê xweştire ji birca mîrê Cizirê"

Sebrî Botanî li ser diwariya rojên xwe weha gotiye :

**"... Eger xweşiya jînê diravê pir û xanim û meyxane ye, min nedît, eger geşt û seyran û tenahi ye, dîsan li min heram bit, her wekû goştê berazê boz li sofî şimo heram. Lê eger xweşiya jînê hezkirina xebat û kêferata rast û paqije, eger xemdariya ji bona welat e, ez kesî ji xwe kêfxweştir û bextiyatir nabînim..."**

û ev şîreta wî ye ji keç û lawan re :

“... Qîzino ... lawino herdem haş û şad bin, da hûn tam bêhna xweşiya jînê bizanin. Çiko kesê ne haş û şad bit bitêrî xebatê jî nayê. Her giz xeman ji xwe re çê nekin, ji bil xema millet û welat û mirovantiya dinyayê ...”

### Berhemên wî :

Li gor ku, li paş dîwana wî “Dilistan : 1984” Rûpelê 73 an hatiya nivîsandin :

**A - Çapkirî :** 1- şîn û şadî 1979 Bexdad.  
2- Dilistan 1984 Bexdad.

**B - Jêrçap :** 1- Dibêjin ( 1 ).  
2- şîn û şadî, çapa duwem.

**C - Neçapkirî:**1- Bilûra çiya, dîwana sisyan.  
2- Pîra gerok.  
3- Dibêjin ( 2 ).  
4- Kulikên Mam Behdin. (Çîrok û şîî’r ji zarokan re).  
5- Pak û pîs ( Çîrok )

Lê ji berhemên wî, li gor ku kurê wî **Beşîr Botanî** ji xelefê Zîbarî re gotin, di hevpeyvînekê de ji dengê Amerîka “Beşê Kurdî” roja 28,10,1998.

**Çapkirî :** 1- şîn û şadî.  
2- Diliston.  
3- Dengê Metîn û Cûdî.

**Neçapkirî :** 1- Komek çîrokên gelêrî.  
2- Romanek li ser gelê Kurd.

---

### Jêder û çavkanî :

- 1- Dengê Amerika “Beşê Kurdî”, hevpeyvînek telefonê bi kurê wî “Kawa Botanî re, roja 26.10.1998.
- 2- Dengê Amerika “Beşê Kurdî” hevpeyvînek telefonê bi kurê wî “Beşîr Botanî re, roja 28.10.1998.  
(Herdu hevpeyvîn, Xelefê Zîbarî bi wan re kir.)
- 3- Pêşgotina dîwana “Şîn û şadî”.
- 4- Pêşgotina dîwana “Dilistan”.
- 5- Gelek pêzanîn ji minre hatin gotin, ji gelek kesan, nemaze ji Mîcerê Egît axa, serokê hoza jêliyan li Dêrikê. û ji kurê Hacî Dehamê Mîro, yê ku xwedîyên gundê Sêgirkan bûn.



# Kî berpirsiyar e ?!(<sup>1</sup>)

**Yek** ji astengên nirxandina berhemên Kurdî (beşê latîni) neyîna tradîsyonên weşanî û çapemenî ne, ku dibine sedemên sergêjî û xwewindakirina hêzên aktîv di warê çareserkirina nizimbûna banê têgihîştinên rewşenbîrî de, yê ku bi rengê bêserûberîyeke giştî rû didin. Ev nîzmî bi gelek faktorên ve tê girêdan, lê berpirsiyarê dîrekt, di vê prosesê de, her dimîne nivîser û rexnegir.

**- Mirovê Kurd nexwende ye, lê nivîser e! . Nivîserê Kurd jî pîş bi xwendinê nake, lê nivîser e! .**

Loma gotebêjên wêjeyî, di warê avakirin û pêşvebirina kultûreke Kurdiye demane, bêber dimînin û di xîzeke (çixz) girtî de pîkol dikin. Ev bêberî û pîkolkirin ne tenha gunehê nivîser û rexnegir e, lê barê hin hêzên dine jî, ku bi bêguhdañ hevpariyê di berdewamiya vê rewşê de, weku faktorên alîkar dikin, û bi rola rûdangêrên weşaneke bêkêr radibin. Loma jî, di danûstandin û axaftinên rojane de, carcaran jî li ser rûpelên kovar û rojnameyan tê gotin, ku îro roj nivîserên gel û kewden di meydana çapemeniyê de pir in, û bi gelek awayan rû didin :

- Mirovê Kurd nexwende ye, lê nivîser e! . Nivîserê Kurd jî pîş bi xwendinê nake, lê nivîser e! .
- Nivîserê Kurd rêz û pergalên avakirinên wêjeyî nizane, lê nivîser e! .
- Nivîserê Kurd pergalên rêzîmên û rastnivîsê nizane, lê nivîser e! .
- Nivîserê Kurd taybetiyên avakirina hevoka Kurdî nizane, lê nivîser e! .
- ...û, bi vî rengî, gelek "lê" yê din!! .

Gelo, çi ji rastiyê di nivîsandin û bilêvkirina van "lê" yan de heye ? . Gelo çapemeniya Kurdî di realîteke wîsan re derbas dibe, yan na ? . û bîngêhên vê rewşê li ser çi zemînê hatine danîn ? .

(<sup>1</sup>) Naveroka vê gotarê, bi taybetî, di hingivê nivîser, rexnegir û birêvebirên çapemeniya Kurdî li Sûriyê. Wîlo jî, bi gelemperî, di hingivê hêzên din, yê ku beşdariyê, çi moralî be, çi jî eborî be, di weşana Kurdî de dikin.

Di vî warî de pîrseke bi seyr xwe dide pêş. Ew jî ew e, gelo nivîserê bi van pesn û nîşanên jimartî be, çawa rê ji weşandina berhemên xwe re dibîne ?!. û weşaneke ku xwe bispêre van xameyên gend û qels, wê çawa cihê xwe di prosesa çapemeniyê de bigre û xwe payadar bibîne ?!.

Bêgoman, li gorî raxistina van pîrsan, çend hêzên aktîv rola bingihîn, di warê çareserkirin û rêvebirina çapemeniya Kurdî de, dileyizin. Têkiliyên van hêzan, bi hev re, pileya birgeşî, têgihiştin û rolnaskirina rewşenbîrî dormador dikin û pêpelûka nîzmî û bilindiya banê rewşenbîriya Kurdî, li gorî asoyên xwe, bi çarçev dikin, û wilo jî berçav dikin, Ev hêz jî li sê celebên sereke par dibin :

## 1 . Nivîser :

Nivîserên Kurd, yên ku bi dûrbîna rewşenbîrî li pîrsgirêkên pêşerojê dinerin, erkên xwe bi dilsozî dinasin û bi berpirsiyarî, bi dilêşî û cegerdarî hewildan û bizavên xwe dikin, da pişkdarên sazîkirin û pêşvebirina çapemeniyeke Kurdiye serwest û resen bin. Lê mixabin, ku beşekî gewre ji xameyên sextebaz helperînên xwe, di bin siha navê nivîser de, dikin û bi rola ziyanonkeran radibin. Bi ser wilo de jî rê ji destdirêjiyên xwe re di çapaemeniya Kurdî de, bê kontrol, dibînin!. Ne tenha wilo, lê beşdariya vî celebî di bin sîwana hewadarî de tê parastin û propoganda jê re tê kirin. Belê, rengê vê hewdariyê çi be jî, eger ne ji giranbuhabûna berhem derkeve, ziyane dîghîne prosesa rewşenbîriyê.

## 2 . Kovar û rojname ...

Kovar, rojname û beşên din yên çapemeniyê cihê peydakirina gêra çalakiyên rewşenbîrî ne. Bi hebûna wan û di rîya wan re nivîser siqa dibe, praktîka xwendin û nivîsînê bi dest dixê û neçar dibe ku bi hemî cûreyê lîteratûrî ve bê girêdan û berdewamiya xwendin û lixwepirsînê bike, da mercên rewşenbîriyê bi dest xîne û bi rola xwe, weku rewşenbîr, rabe û erkên xwe pêk bîne. Lê mixabin, ku di gelek waran de, ev kovar û rojname rola xwe bi sextebazî pêk tînin û bi naveroka xwe kevelekî pûç û vala dimînin. Ew jî ji wê yekê der tê, ku serkar û rêvebirên wan ji piş û dîtinên rewşenbîrî şûstî ne, wilo jî di warê zimanzanîne de qels û kêmin, lê dilê berjewendiyên taybet û kesane ne. Loma, li pey nav û nîşanên zir û xapandî digerin.

Ji vê yekê jî mirov dipelîne, ku çapemeniyeke bêkêr û neşûngirtî, di gelek movikên xwe de, tê belavkirin, nîşana wê dibe bêguhdanî û bi durveyeke bêberpirsiyane tê pêçan.

**3. Organên siyasî, dezgeh û binetarên kultûrî,** yên Kurdî, ku bi rola piştgirî, navdarî û reklamê, di berçavkirin û belavkirina weşanê de, dileyizin û li

gorî têgihîştinên xwe yên taybetî ji pirsra Kurdî re, di hemî werselên kurdewariyê de, bi rola xwe radibin piştgiriyeke eborî û moralî di warê çap û weşanê de dikin.

Wilo jî danasîna xwedîxamên jîr û zîrek, xwedan hiş û mêjiyên ron, zelal û dûrbîn erkên xwe dibînin, da realîteke rewşenbîrî himbêz bikin û peydabûneke payebilind bi dest xînin, da êdî desthilat bin, pirsgirêkên kurdewariyê, di hemî waran de çareser bikin. Lê, dîsa mixabin, ku hin ji van organ, dezgeh û binetaran dikevin bin bandora hin elementên sextebaz û nêzbîn de, yên ku di psîkolojîya xwe de nesax û nesaxlem in, loma erkên xwe pêk naînin û rola xwe nanaşin, wilo jî pêwîstiyên demê ji hev naderxin. Êdî dibin gerînokên genîgolan û her kesê qels û bêhêz diqurpînin, dibin bablîsokên kilaxkorê û her kesê sivik û bêrewa, weku kelemperê, li ber bayê xwe, çavmîç, difirînin. Wilo, ne yê binavbûyî, ne jî yê berbêketî desthilatên danê ne, loma çapemeniya Kurdî, di gelek waran de, sergêj û çavmîçan li xwe vedihewîne, dûrî pispûr û zanyaran diçe, loma dibe garsîna şerên kayîni û bi rengê mozayîkeke leylandî, ku reng û qilafet tê de ji realizma xwe derdikevin, rû dide.

**xwênerê Kurd li ser textê  
xwexapandinê rûdine, bi  
mildanî û şêranî li  
çapemeniya xwe napirse, wê  
naxwîne û xwe tê re nabîne**

Pêvî van hêzên sereke, ango hêzên zîlangêr di tevgera çapemenî de, hêzeke din bi navê hêza xwêner bi roleke alîkar, di teysandin û serpişkiya nivîsê û nivîser de, dibe mifta kontrolkirina çapemeniyê û pîvanên bikêrî û bêtêriya heyber û heyberda bi xwe digre. Lê mixabin, ku xwênerê Kurd, di kûraniya nava xwe de, xwe xav û xil dibîne, qels û kêmdinase û nedesthilatiya xwe hemberî nivîsê û nivîser dipelîne. Bi ser vê yekê de jî li ser textê xwexapandinê rûdine, bi mildanî û şêranî li çapemeniya xwe napirse, wê naxwîne û xwe tê re nabîne. Wilo, ji zîlana rewşenbîriyê dûr diçe û bi rola xwênerê hêzdar, tamnas û tamdar ranabe. Êdî hişê wî xilmaş dibe û dikeve bin bandora hoşeyên xwe de û ber bi tûmanbîniyê de tê kişandin, loma ji çerxa xwe derdikeve û bi asanî dikeve gêra mêldariyê bêbingeh de, ku şerê beranî pê xweş dike. Hinga amade ye, ku di vî şerî de koran bi kil û neynik bike, keçelan bi kum û kolos bike, seqet û bawerîyan jî bi dar kopal bike.

Demek, li gorî raxistina vê panoramê, çapemeniya Kurdî di rewşeke bêserûber re, dûrî guhdan û lêpîrsînê, derbas dibe, lê konê mij û moranê xwe berdide ser têkiliyên hêzên zîlangêr û mirov, di vê navberê de, tar û mar dibe.

Eger em karibin van têkiliyan bi rewani ji hev vewejêrin û erkên her hêzekê nas bikin, higa em dikarin, ne tenha bersiva pîrsên xwe bidin, lê wilo jî, em dikarin behweriyên xwe, di vê bersivdanê de, bi zelalî diyar bikin û dergehê axaftineke girîng û pêwîst, di vî warî de, di navbera van hêzan de vekin. Ev danûstandin, di behweriyên me de, wê bibe gavavêtineke giranbuha ber bi çareserkirina piraniya astengên demane de, yên ku xwe li dora çapemeniya Kurdî radipêçin. Lewre, em xwe bivênevê dibînin, ku bandora van hêzan li ser hev û li ser nizimbûna pêpelûk

û banê çapemenî û rewşenbîriya Kurdî binasin, da çaredîtina sedemên banenizmî û şûdemayîne ne zor û giran bin, da astengên birêvebirina çapemeniyê çareser bibin û problemên dihevalandina ne durist di tîkiliyên van hêzan de bêne hilandin. Da wilo jî ev rewşa gêberdanî, di çapemeniya kurdî, bê rakirin û pergala jê re bêne danîn.

Belê, beşekî mezin jî nivîseran bi bîkêrî xwe dikşîne gêra çapemeniyê, bê ku sînorên rewşenbîrî û kewdeniyê bizane û wan jî hev derxe.

Lê, ku ev beş fêrî alfabêta Kurdî dibe, xwe mafdar dibîne ku di dergehêkî fereh ve derbasî meydana çapemeniyê bibe, da cihê xwe bi dergevanî li ber embara pend û şîretan bigre û wan, li gorî şelekoriya hiş û dîtina xwe, rêz bike û biwerîne. Bi ser wilo de jî, xwe di bin sîwana hewadarî û mêldariyê de diparêze. Êdî, bi xurtî, tê himbêzkerin û propoganda ji navê wî re, ne ji berhem û bîr û behweriyên wî re, tê kirin. Lewre, gelek navên weku çîyan berz dibin, bi ser ku di rastiya çapemeniyê de çîyayên leylanî dimînin. Lê, tiştê herî balkêş di çapemeniya Kurdî de, şîyan û hêzdariya rêxistinî ye, ku bi desthilatî per û basikên xwe diavêje ser û xwe raspêr (guardian وصي) li ser dibîne. Ne tenha wilo, lê dikare kovikên Parmodî, yên ku her tiştî û her kesî bêhêz û bêhewes dihêlin û wan bi asanî diqurpînin, biafirîne. Wilo, her tişt bi hingivtina van rêxistinanan dize, tê hingavtin, yan jî dimre.

**siyasetmedariya Kurdî çapemeniyê weku alav bi berjewendiyên xwe ve, ne yên millet ve, bi hiştengî girêdide. Loma, dûrî çapemeniyeke resen, hêzdar û hişmend diçe**

Belê, rêxistin tim hewl didin, ku piraniya şax û beşên çapemeniyê bi xwe ve girêdin (wilo jî dezgeh û binetarê kultûrî bisipêrin xwe), da kontrola xwe deynin ser hemî movikên jîyanê û civakê lagir (berferman), li gorî dîtî û berjewendiyên xwe, perwerde bikin, da reşma wê di destên xwe de bihêlin.

Sedema vê kontrolkirinê jî ew e, ku siyasetmedariya Kurdî çapemeniyê serkehniya propogandayê jî xwe re dibîne û wê weku alav bi berjewendiyên xwe ve, ne yên millet ve, bi hiştengî girêdide. Loma, dûrî çapemeniyeke resen, hêzdar û hişmend diçe û wê weku alav bo şerê hebûna xwe bi kar tîne.

Tîkiliyên navbera hêzên zîlangêr, di rewşeke wilo de, forma bazirganiyeke premîtîv distînin û bazarên ser bi ser têne kirin. Ango, nivîser kirtûpirtên bîkêr dadixe serfûradanê û semyandar buhakî arzan pê dide. Lê ji bêçareyî bazirganiya xwe dimeşînin. Terazûya wê jî dibe çapemenî, lewre ziyana dighe form, şewe û naveroka çapemeniyê bi xwe.

De ka bêjin, kî di vê prosesê de berpîrsiyar e?!! Berê hatiye gotin : “Arzan kirî, heban dirî !!”.



# Salvegera Rewşen Bedirxan

Urdun

Piştî têkçûna Sultan Ebdulhemîd û di 1908, an de hatina Sultan Reşad, hîn bêtir rewşa azadiyê pêş ve çû û efû ji girtiyan re derket. Di wê demê de Salih Bedirxan deh salên xwe di girtûgehê de buhurandibû. Bi wê efûyê re ew ji hefsa daîmî (muebet) xelas bû û ew şandin bajarê Qeyseriyê. Di roja 11ê meha Tirmeha sala 1909 an de Sultan Reşad hat ser hukum. Di wê rojê de keçek ji Salih Bedirxan re çêbû. Ew keç bi xwe Rewşen Bedirxan bû. Piştî ku du salên Rewşenê li Qeyseriyê qediyar, malbata wan hatin Stenbolê; li wir gelek ji malbata Bedirxaniyan hebûn. Salih Bedirxan ji Stenbolê jî berê xwe da riya şamê. Bavê Rewşenê tu car nedisekinî û bi hêz û bi hunera xwe ji bo milletê Kurd dixebitî, li xweşî û kêfa jiyane nedipirsî. Ew li mal û li nav û deng ji nadigeriya. Salih Bedirxan gelek nivîs di kovar û rojnameyan de çapdikir Daxwaza wî ya yekemîn, di jiyane de hişyarkirin û bi pêşxistina milletê wî bû. Ew bê westan, şev û roj li kar bû.



**Rewşen Bedirxan**

Salih Bedirxan piştî hatina xwe ya şamê çendekî bê kar ma. Di vê navê de şerê Cihanê yê Yekemîn derket; mercên jiyane pîrr dijwar bûn. Ji bêçarî berê xwe da kar û li Zîndana Keleha şamê kar kir. Lê mixabin bi êşa tîfoyê ket; pîrr dirêj najot, di 30yê Adara 1915, a de mir. Di wê demê de temenê Rewşenê negihiştibû şeş salan.

Piştî mirina Salih Bedirxan diya Rewşenê ew şand dibistanê. Rewşenê piştî ku dibistana seretayî xelas kir çû dibistana mamostetiye (Dar el Muelfmat) û ew jî xelas kir. Rewşen bû mamoste û ji nîşên sêyemînên ku li Sûriyê dibistana mamostetî qedandibû tê hesibîn.

Rewşen Bedirxan di sala 1925 an de diçe bajarê Kerehê (Urdun) û li wir dibe berpirsiyara dibistanê. Di sala 1928 an de vedigere şamê, dibe mamoste û berpirsiyariya gelek dibistanan dike. Di sala 1934 an de dibe endamê Komela Yekîtiya Jinan (li Sûriyê). Di roja 22.2.1935 an de bi Mîr Celadet Bedirxan re dizewice. Bi navên Sinem û Cemşîd keç û lawek ji wan re çêdibin. Di sala 1944 an de li ser navê jinên Sûriyê, li Misirê beşdarî Kongra Jinên Cihanê bû.

Jiyana Rewşen Xanimê a niştimanî pîrr fireh û kur e; ew bi hemû hêz û ramana xwe li dijî Qolonyalizma Fransa sekinî û piştgiyariya doza Erebi kir. Bi taybetî jî wê doza gelê Filistinê parast û wê di dibistanên Ereban de mamostetî kir û gelek nivîs û

gotar di kovarên Erebi de weşand. Rewşen Xanim bi qasî ku li dibistanê mamoste bû, ewqas jî di xwedîkirina zarûkan de mamoste bû.

Jiyana wê ya niştîmanî gelek giranbuha ye; cîhê serbilindî û mezinahiyê ye. Di gel ku Rewşen Xanim Mamoste bû, xebata wê di behsa zîndan de, ji bo rastkirina tenduristiya keç, jin û pîrekên bê sincî yê di hebsan de jî hebûn. Bi aramî û bihnfirehiya xwe dest diavêt hemû aloziyên jiyane. Qurefî, serşorî di ferhenga jiyana wê de nebû. Jîna Rewşen Bedirxan neynika jîn û danûstandîna Mîrê Gewre Celadet Bedirxan û malbata Bedirxaniyan bû. Ew xelega gihandîna dîroka mîletê xwe yê kevin û nû ye. Ew dîroka lehengiyê ya dût û dirêj a ku bav û bapîrên wê bi sedan salan ji bo Kurdistanê kiri ne. Jiyana wê ne kêmtî jiyana bav û kalên wê bû. Nemaze di warê dijwarî û zehmetiyan de piştî mirina Celadet Bedirxan.

Dibêjin li pişt her mêrê gewre (mezin) jinek gewre heye. Belê Rewşen piştevana mezinahiya Celadet Bedirxan bû. Piştevana amadekirina kovar û pirtûk û hemû afirandinên mîr bû. Di gel xebatên hêja ewê bi xwe jî di kovara Hawarê de dinivîsand. Rewşen Xanim di kovara Hawarê hejmara 27, an de, di nivîsek xwe ya bi navê Kebanî û Mamoste de ewha dinivîse : **“Mêrên ku qedera mîletan di destên xwe de dibin, li ber destên jinan xwedî dibin. Terbiya xwe dielimin, heta axa gorinan ji bîr nakin û ew tim û tim li wan hukum dikin. Ji lewre methelokê gotiye : “Kurmê şîrîn heta pîrîn”.**

Rewşen Bedirxan karê jîna Kurd netenê kebanî û xwedîkirina zarûkan dibîne, li ba wê karê jinan ê girîng li dijî nezaniyê şerkirin û perwerdekirina zarokan e.

Bêguman di vê xebata perwerdeyî de rolê welatperweriyê jî ji bîr nake. Rewşen Bedirxan bi dengekî bilind û zelal ewha bang dike : **“Xwehên min ên delal, herwekî hûn jî dizanin derdê mîletê me yê mezin û xedar nezani ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik mîletên xwedan hukumat û teşkîlat vê nexweşiyê di xestahaneyên xusûsî de derman dikin û ji wan xestaxanan re dibêjin dibistan. Mamoste bijîşkên wan xestaxanan e”.**

Em dikarin bibêjin ku Rewşen Bedirxan, bi xebat û nivîsên xwe di pîrsa jinan de çalakiyên hêja daye. Rewşen Bedirxan di gotarek xwe ya di hejmara 28 an a Hawarê ya bi navê “Jin û bextiyariya malê” de ewha dinivîse ; **“Gelek jin hene bawer dikin ku rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wa ye. Sea’det û bextiyarî ne ji dewlemendan bi tenê re ye. Xincîkên belengazan hene ku sea’det û bextiyarî, ji qesra dewlemendan bêfir û çêtir tê de qerar digirin û bi rihati cih dibînin”.**

Rewşen Bedirxan dixwaze vê yekê bi jîna Kurd bide fêmkirin : Xweşî û bextiyarî ne pere û qesr û qonax in; belê xweşî ew e gotîna xweş, danûstandî, kar û xebata ku mirov ji mîlet û welatê xwe re bike.

Xweşiya jiyane ya bi peran diqede lê xweşiya jiyane ya welatperwerî û zanîne naqede.

Ji bilî nivîsîna bi zimanê Kurdî, Rewşen Xanimê bi zimanê Erebi jî gelek nivîsar û pirtûk li ser Kurdan çap kiriye.

Rewşen Bedirxan di sala 1971 an de beşdarî Kongra Sêyemîn a Yekîtiya Jinên Kurdistanê (li başûrê Kurdistanê) bû û bi piştgiriya xwe serketîna wan parast. Di



eynî salê de rûmeta endamtiya Korî Zanyarî Kurd girt û di wê demê de li ser daxwaza Korî Zanyarî Kurd çû Stenbolê. Ev çûna wê ji bo komkirin û civandina destnivîs û pirtûkên ku di arşîv û pirtûkxaneyên Tirkî de, yê ku li ser Kurdan e bêne civandin û ji Korî Zanyarî Kurd re bêne rêkirin bû. Bi rastî ji ev layiqî pesindanê ye ku ew di vî karê xwe de bi zanebûn û bi bêdengî bi ser ket.

Rewşen Xanimê di sala 1956 an de, di gel Dr. Nurfî Dêrsimî, Hesên Hîşyar, Heyder Heyderî û Osman Efendî li bajarê Helebê Komela Zanistî û Alikariya Kurd damezrandin. Rewşen Xanim bi bîhnfirehî û aramiya xwe li dijî hemû alozî û dijwariyên jiyânê bi ser diket.

Jiyana mirovan bi salan nayê jimartin; ne ji bi mal û milkê ku mirov li dû xwe dihêle. Jiyana bîranîna şopeke kamûranî, qencî, comerdî û mirovatîyê ye. Nêmetze ji bo mirovên xwedî berhem, şop, têkoşîn xebat û kar e. Ji ber vê yekê ez dikarim bibêjim ku Rewşen Xanim nemiriye; ew ji me haydare û em ji pê haydar in. Herçiqaş wê di roja 01.06.1992 an de ji nav me koç kir ew di dilê me de dijî. Heta roja mirinê ji ew ji bo gel û welatê xwe xebitî. Rewşen Xanim di doşeka mirinê de ew tişt ji min re digot : **“kurê min dema em hebûn, hûn negiha bûn; îro hûn giha ne; lê mixabin em nema ne. kurê min, ji hev hezbikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin Kurê min, bela wela nebin”**.

Piştî ku ez hinekî li ser rewşa Kurdistanê Başûr û li ser hîlbijartinan sekinîm, Rewşen Xanimê gotina min birî û ewha got : **“Kurê min, yekîtiya Kurdan bide min, ezê Kurdistanek azad bidim te”**.

Ev e Rewşen Bedîrxan, ya herdem wekî bav û kalê xwe êşa mîlet û welatê xwe dikîşind û qet ji bîr nedikir. Wê mezinahiya xwe ji sitûnên Birca Belek girtibû.

Rewşenbîriya xwe ji dibistana Sor, ji kaniya Cizîrî û Xanî wergirtibû.

### **Berhemên wê yê çapkirî ev in :**

- 1- Bîranînên Jinekê, weger, ji zimanê Tirkî bo Erebbî, 1951.
- 2- Xeramî We Elamî, werger, (çîrok) ji Tirkî bo Erebbî 1953.
- 3- Bîranînên Mamosteyekî (sê pirtûk), ji Tirkî bo Erebbî 1954.
- 4- Rûpelên ji Toreya Kurdî 1954.
- 5- Nama Gelê Kurd (Helbesta - Goran) ji Kurdî weger bo zimanê Erebbî 1954 (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pirtûkê nenivîsiye).
- 6- Nama ji Mustafa Kemal Paşa re, werger ji Tirkî bo zimanê Erebbî (Ev pirtûk bi alîkariya min hat nivîsîn û çapkirin - DZ).
- 7- Bîranînên Min, Salih Bedîrxan, werger, ji Tirkî bo Erebbî (Ev ji bi alîkariya min hat nivîsîn û çapkirin - DZ).
- 8- Elred e'le Elkosmopolitiye, Mehmûd Şîniwî, werger (ji ber hin sedemên navê xwe li ser nenivîsiya).

### **Pirtûkên wê yê neçapkirî ev in :**

- 1- Bîranîna jinekê (perçê duwemîn).
- 2- Bavê min Abdulhemîd (ji Tirkî wergerandin. Nivîskara pirtûkê keça Abdulhemîd, Ayşe ye)?
- 3- Bîranînên Min.

# Aboneyên "HAWAR" ê

## Dilawerê Zengî

Di hejmara "14" an de, me nav û warê hin xwendevanên kovar "HAWAR" ê weşandibûn, A niha jî em birrê dawî ji wan diweşînin :

### 7- Iraq : Bexda :

1- Tewfîq Wehbî beg. 2- Elî Hemadî Beydewî. 3- Seîd beg Qezaz ( Cîgirê kargirê hundir ya a,m). 4- Elî Yasîn. 5-Ce'fer Muhemmed Silîvanî (kargirê tirêne). 6- Naneyî Serkewtin ( Nadî irtîqai el Kurdî). 7- Marif Ciyawok (wezareta dadmendiyê ). 8- Beşîr Muşîr beg. 9- Kargirê kovara Gelawêj. 10- Hecî Elî Heyder. 11- E'qîd Izet Tewfîq beg (serkêşê liqê yekê yê topê). 12- serok Fuad A'rif beg (serkêşê zabîten paytexte - A'sîmê). 13- Serokê ewil A'dil Ehmed Raxib beg. 14- Dr. Fadil Reşîd Eqravî (Misteşfa Mecîdiyê). 15- Mete Hina Cezrawî. 16- Serokê ewil Afram Hindo (dibistana çekên sivik). 17- Elmuhendis Resîd A'rif (xan şehbender). 18- Elî Kemal beg (xan ester Abadî). 19- Mecîd beg Mustefa. 20- Sema'n Fereco Cezrawî. 21- Muslih Behadîn Neqîşbendî (kuliya hiqûq). 22- Hemed Seyid Ehmed Xanqah (kuliya hiqûq). 23- Reşîd Balcanî (kuliya hiqûq). 24- Celîl Hoşyar (kuliya hiqûq). 25- Mesûd Şêx Behadîn Neqîşbendî (kuliya hiqûq). 26- Osman Mustefa (kuliya hiqûq). 27- Celal Hamid beg Caf (kuliya hiqûq). 28- Burhan Hamid beg (kuliya hiqûq). 29- Muhemmed Seîd Ibrahîm Xelef (kuliya hiqûq). 30- Taha Mihyedîn (kuliya hiqûq). 31- Kaney E,zîz Dizey (kuliya hiqûq). 32- Ehmed Kerîm şerîf (kuliya hiqûq). 33- Mukerrem Talebanî (kuliya hiqûq). 34- Zeyd Ehmed Osman (kuliya hiqûq). 35- Nûrî Tewfîq (kuliya hiqûq). 36- Husên Hac Hesên (Dar mue'limîn ela'liye). 37- Cemîl Reşîd E'madî (Dar mue'limîn ela'liye). 38- Sedîq Ebdilrehman Etroşî (Dar mue'limîn ela'liye). 39- Sadiq Behadîn (Dar mue'limîn ela'liye). 40- Salih Reşîd (kuliyet dar elmue'limîn). 41- Salih Ebdullah Yûsifî (kuliyet dar elmue'limîn). 42- Hidayet Ellah Huseynî (kuliyet hendesê). 43- Mustefa Muhemmed Elî. 44- Muhemmed Reûf şalî. 45- Derwîş Ebdullah Cebbarî. 46- Naib Sedîq Seyid Taha (Meclîsa niyabî). 47- Major Êdmons (ministry interior).

### Kerkûk :

1- Refîq Hilmî beg (nuftîşê mea'rif). 2- Celal Qeftan (derman firoş). 3- Şêx Ebdilkerîm Berzanî. 4- Sema'n latî Cezrawî. 5- Şêx Ebdilqadir Muhemmed beg. 6- Ebdillah Se'îd beg. 7- Ehmed Kemal beg. 8- Muhemmed Elî beg. 9- Hac Ehmed beg E'qravî. 10- Muqedem Emîn beg Rewandozî. 11- Muqedem Şewket Osman beg. 12- Ezîz Ebdellah. 13- Reûf Ehmed. 14- Xeyrî Salih. 15- Elî Ebdilezîz. 16- Ezîz A'rif. 17- Celal Muhemmed Baltî. 18- Fettah Şalî. 19- Ismet Mecîd. 20- Hemîd Tahir. 21- Celal Qadir. 22- Rustem Efrasiyab. 23- Yûsif Muhemmed Elî. 24- Ebdilkerîm Qasim (Ji hejmar 12- ta 24 an giş Zabîtin bi ritba Mulazim ewil). 25- Mustefa Feqî. 26- Colonel (kolonel) Lyon (political officer Kirkuk).

### Zaxo :

1- Mamoste Muhemmed Ebdilqadir. 2- Hisnî Reşîn. 3- Mamoste Xelîl Reşîd. 4- Hakim Yûsif E'wnî beg. 5- Haşîm Nicim. 6- Hişyar Hazim beg. 7- Ibrahîm

Remedan. 8- Seîd Hecî Yûsif. 9- Xelîl Hîdayet. 10- muhemmed Seî'd. 11- Ebdullah Seî'd. 12- Samî Muhammed Hincis. 13- Xalid Hesen. 14- Şakir Seîd. 15- Nicim Hacî Ebdilqadir. 16- Xelîl Hoşyar. 17- şeffîq İhya. 18- Ebdî Axa Cemîl Axa. 19- Ebdullah Ehmed Bicir. 20- Dr. Wedî' Cezrawî. 21- Hacî Axa Şemdinan.

### **Erbîl ( Hewlêr ) :**

1- Fetah Reşîd Beg. 2- Sebrî Reşîd Beg. 3- Mulazim Osman Beg. 4- Mulazim Xesro Hacî Axa. 5- Salih Beg Mîran Reşîd Beg. 6- Ebokat : Muhammed Tahir Şêx Ebdulrehman Etrûşî. 7- Ebokat : Mustefa Muhammed Ele'ziz. 8- Wênêkêş : Ebdulrehman Mukuryanî. 9- İsmâil Şe'ban. 10- Mîran Osman Beg Qadir Beg. 11- Hacî Axa Çiqil Axa Dizeyî. 12- Xurşîd Nûredîn Reşîd Axa. 13- Kemal Osman Axa. 14- Qirni Nafi Reşîd Axa. 15- Reşîd Ebdulqadir. 16- Tahir Reşîd Axa Dizeyî. 17- Cewher Husên Mele Axa Dizeyî. 18- Mecîd Çoqil Axa Dizeyî. 19- Nasih Reşîd. 20- Se'dedîn Şerif. 21- E'ziz Xurşîd Axa Xoşnaw. 22- Enwer Muhammed Emîn Dizeyî. 23- Yehya Muslim Al Hîdayet. 24- Mehmûd Mehemmed Axa. 25- Tahir Silêman Çelebî. 26- E'ziz fetah. 27- Nafi' Yûsif. 28- Xîdir Hesen. 29- Cemal Cemilê mameste. 30- Rife't İsmâil. 31- Omer Elî Axa Dizeyî. 32- Hiznî Mukuryanî.

### **E'madiyê :**

1- Ebdile'ziz Axa. 2- Ehmed Hacî Ebdilletif. 3- Tahir Reşîd. 4- Yûnis Emîn. 5- Hesen Mustefa. 6- Ese'd Ehmed. 7- Muhammed Reşîd Hesen. 8- Ehmed Hacî Şe'ban. 9- Şe'ban Xalid Emîn. 10- Ebdilrehman Hesen. 11- Seî'd tahir Axa. 12- Hesen Xelîl. 13- Seî'd Resûl. 14- Seî'd Emîn Ebdillah. 15- Nû'man Emîn. 16- Muhammed Hacî Şe'ban Axa. 17- Cemîl Behadîn. 18- A'dil Hirmiz. 19- Ehmed Beg Hacî Reşîd beg. 20- Seî'd Şêx Behadîn Neqîşbendî. 21- Şêx Xiyasedîn Neqîşbendî. 22- Tahir Şêx Mezher. 23- Ebdullah Xalid. 24- Şêx Beşîr Tahir. 25- Se'dellah Sedîq Axa. 26- Tahir Muhammed. 27- Şêx Beşîr Şêx Ebdilrehman. 28- Mele Enwer Şêx Tahirê Maî. 29- Taha Şêx Meherê Neqîşbendî. 30- Metran Hinna. 31- Mamoste Şemûn, Mamostayê Dibistana Kanî Masî. 32- Mamoste Ehmed Hacî, Mamostayê Dibistana Kanî masî. 33- Necib Elî Beg.

### **Silêmanî :**

1- Hacî Tewfîq Beg. Pîremêrd ( xwediyê rojnamaya Jîn ). 2- Hamîd Qerec Beg. 3- Elî Cemîl Said. 4- Muhammed Ebdilqadir Xelef. 5- Samî Muhammed Emîn. 6- Eslan Muhammed Nasir. 7- Şukrî Muhammed Elî. 8- Ebokat Ebdilqadir Axa Hac Mele Miledîn. 9- Zeî'm Şêx Mehmûd. 10- Nûrî xwediyê kutêbxana Elmea'rif. 11- Ebdilrehman Xidir, xwediyê kutêbxana Azadî. 12- Muhammed Kerîm Axa. 13- Muhammed Ferec Şalî. 14- Muhammed Nûrî E'la. 15- Cemal İbrahim Axa. 16- Selîm Beg Emîn Baban.

**Ranye :** Fewzî Reşîd Fayîq. 2- İsmâil Serheng. 3- Kemal Resûl Beg Baban.

### **Mûsil :**

1- Public relation Section Brîtîsh Konsulat. 2- Major Mac Nearnie Assistant political officer. 3- E'ladîn Seî'd. 4- İsmâil Seîd Axa Doskî. 5- Mulazim Taha Mustefa. 6- Mulazim E'bdilrehman Teybê Mifrî. 7- Ehmed Mustefa. 8- Muhammed Şahîn Mîrza. 9- Remedan Muhsin. 10- Muhammed E'bdilqadir

Ermeqanî. 11- Hesen Taha Kitani. 12- Mele Ehmed Goyî. 13- Ebokat: Ebdilmecêd Reşid Beg. 14- Ebokat: Şahin Mirzayê Sofî. 15- Mele Ese'd.

### **Dihok :**

1- Muhemmed Salih Cibraîl. 2- Sebxetullayê Muftî. 3- Ismaîl Seîd Axa yê Germadî. 4- Nûr Muhemmed Şêx Al Şêx U'bedê Birîfkanî. 5- Zeynela'bidin Şêx Nûrî yê Birîfkanî. 6- Şêx Memdûhê Al Şêx Nûrî yê Birîfkanî. 7- Seîd Axa Dîwâlî. 8- Ehmed Hacı. 9- Mele Xelîl. 10- Xûrî Yûsif. 11- Mele E'bdilhadî. 12- Ebdilmecîd Kemekey. 13- Ismaîl E'yan. 14- E'lî Husên Kawî. 15- Muhemmed Salih Husên. 16- Ni'met Ehmed Sultan. 17- Yûsif Mîrxan. 18- E'bdullah Nebî. 19- Muhemmed Omer.

**Sincar :** 1- Dr. Ce'fer Muhemed Kerîm Beg.

**Besra :** 1- Muhemmed Axa Zade Tutuncî. 2- Ehmed Muhemmed Axa Payeşar.

**Kiwêsinciq:** 1- Ziyad Axa Xefûrî. 2- Ebdulrehman Hacı Es'ed. 3- Ebdulhemîd Hacı Tewfîq. 4- Kaka Hacı Mehmûd. 5- Bazirgan E'bdulrehman. 6- Sabir Hacı İbrahîm.

**Rewandoz :** 1- Şêx U'bedilla Zeyno. 2- Marif Beg Şêx Xerîb. 3- Kutêbxana serkewtin. 4- Mitran Mar Yûsif.

**E'qra :** 1- Mustefa Beydawî. 2- Mele Seî'dê Qadî. 3- E'bdulrehmanê Elîyê Ermexanî. 4- Samî Sebrî.

**Celûla :** 1- Mulazim Nacî Hesenê E'madî.

**Diwanîyê:** 1- E'qîd Nûrî Muhemmed Beg Baban. 2- Mulazim Zahid Muhemmed Salih.

**Xaneqîn :** 1- E'bdile'zîz Fewzî Nûrî Muhemmed.

**Hebanîyê :** 1- Macûr Ziya. 2- Melek Yaqo Melek İsmâil. 3- Mulazim Casim Beg.

**Zibar :** 1- Îzet beg 'Ebdulezîz. 2- Mustefa Xoşnaw beg. 3- Muhemmed Salih Şe'ban. 4- Mele Mustefa Barzanî (Barzan). 5- Şêx Ehmed Barzanî. 6- Şewket Nu'man.

### **8- Îran :**

**Kermansah:** 1- Edare Darayî Silêman Xan behramî. 2- Dr. Ebdulkerîm Se'dî. 3- Silêman Xadim. 4- Silêman Xan Behramî.

**Hemedan :** 1- mehmûd Kurmanc. 2- Kak Tewfîq Amînan. 3- Mehmûd Sîtanyan. 4- Seî'd E'zîz. 5- Kak Ebîderî. 6- Haşim Ce'fer Zade. 7- Xfûr Yûsif. 8- Xesro Arakî.

**Senendec :** 1- Şehabêdin Mihê. 2- Şêx Muhemmed Mihdî Ayatullah Mirdoxî. 3- Xane Esale Sitwan xulam Eyûb. 4- Salih Eqlidî. 5- Muhemmed Sehîfî. 5- Izetullah Şûca' Erdelan. 6- İmam Cumê'. 7- İstad Resmî. 8- Nasir Azad Por. 9- Sedîq Mudîr. 10- Seyid Mecîd Behmenî.

**Seqiz :** 1- İbrahîm Med Nijad. **Qesir**

**Şerîn :** Rehman Hatim.

**Mehabad :** Marif Kokey.

**Rewanşer :** Haşimê Beresed, bi destê Seyid Tahir mîr Zade Haşim beresed.

**Senqer gelayî :** Edare maliyê Ebdilselam mu'temid.

**Tehran :** 1- Reşid Yasimî. 2- Şah Riza Koçe Enwer. 3- Nasir Xesro. 4- Serçeşme Xiyaban Nizamiye Koçey Ahinciyan bitewesit Ismaîl Xan bixeff İhsan Nûrî Paşa.

# Hevpeyvînek li gel Pro. Dr. Celîlê Celîl

Nûnerên kovara "Pirs"ê roja 24.06.1997 hevpeyvînek bi navdarê hêja Dr. Celîlê Celîl re birin serî. Bêguman, navdariya Dr. Celîl seranserî Kurdistanê ji kar û xebata wî der tê. Ewî weku pispor, di warê Kurdologî de, xebateke bê westan, di demeke dirêj de, berdewam kiriye. Loma li ba her kesê ku têkiliyên wî bi pirsê Kurdî re hebin nas û navdar e, nemaze li ba Kurdên Sûriyê. Dr. Celîlê Celîl xwe pir bi kurtî da nasîn, dibêje : Sala 1936 an, di roja 26 novemberê de, li Erîvanê, ji dayika xwe re bûme. Ez ji malbata Casimê Celîl, ya navdar, im. Min xwendina xwe ji Erîvanê standiye. Min Salên 1954-1959 xwendina Unîversîtê, Fakulta dîrokî, bi dawî aniye û dîplom bi dest xisitye. Paşê çûme Lenîngradê û salên 1959-1963 li ser doktora xebitîm. Mijara xebata min "tevgera azadiyê di salên 1850-1880" yî de bû. Min doktora tê de biriye.



Prof. Dr. C. Celil

Pişti vê yekê ez li Erîvanê vegeriya û bûme karmendê Instîtûta rohilatzaniyê, para Kurdologî.

Gelek pirtûkên min, di warên dîrokê, leteratûr û folklorê Kurdî de çap bûne. Min di ser (40) pirtûkî re weşandiye. Hin ji wan hetine wergerandin û bi zimanên Rûsî, Erebi, Tirkî, Ermenî, û Kurdî (Sorani û Kurmancî) hatine weşandin.

Vêga, ez li Viyênayê me -bi mêvani-. Ez profesorim û li Unîversîteya Viyênayê di Kudologiyê û kultûra Kurdî de xebatê bi rê ve dibim.

**Pirs** - Dr. Celîl, eger hûn karibin, xwendevanên "Pirsê" bi berhemên xwe bidin naskirin. Ji wan, yên çapkirî, yên li ber çapê û yên hîna di warê pirojyên pêşerojê de.

**Dr. Celîl** - Belkî Kurdên Sûriyê bêtir min, di rêya pirtûkên min yên çapkirî re, nas dikin, ji ber hin ji wan hatine wergerandin û bi wergera xwe ya bi zimanê Erebi belav bûne.

Nuka dora (10-12) pirtûkên min û Ordîxan li ber çapê hene, Lê ji ber problemên eborî (malî) rawestiyane û hîna bi destên xwendevanan şa ne bûne.

Nuka ji, weke proje, ez Kataloga destxetên Kurdî dinivîsim, û min gavin baş di vî warî de avêtine (min dora 250 destxetên Kurdî berhev kirine) û seva vê yekê ez hatime Sûriyê.

**Pirs** - Bibuhurin Dr. Celîl, mebesta we ji "destxetên Kurî" çi ye ?

**Dr. Celîl** - Destnivîsên Kurdî, yên kevnar tanî salên 1945 an, projeyê nivîsandina min e. Yek ji armancên vî karî jî ew e, ku ez belabûna (rûdana) çaviyên rewşenbîrî û zanyariyê, bi demê re, berçav bikim, û ez wan li ser karta hebûna Kurdan tesbît (bi cih) bikim. Bilî vê yekê, gelek armancên din jî ristika vî karî dixemilînin.

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn dikarin hinan ji van armancan, bi kurtî, berçav bikin?

**Dr. Celîl** - Belê, ji wan: Danenasikirina navdarên Kurd yên di dîroka kultûrî de wînda, naskirina kêşana xeta (xêza) Kurdî, naskirina jimar û rengên tîpan, naskirina şeweyê pêkanîna nivîsandinê û ....

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn dikarin, li gorî dîtinên xwe, rewşa Kurdên Sovyetistanê, berî û piştî hêrivandinê, bidin ber hev? û gelo, hêviyên çareserkirina problemên Kurdayetî, yên rûdayî, piştî rewşa nû, ya vî welatê hêrivî, çi ne?

**Dr. Celîl** - Meseleke Kurdî heye (ew jî ya Kurdên Sovyetê ye) dibêje: "Em çûn birû çêkin, me çav li ser kir". Belê, dema prîstroyka serbestî, azadî û serxwebûn anî, em Kurd bê war bûn. Piştî hukmê Mosko rabû, ne tenha me tiştek bi dest nexist, lê bi ser wê de jî, dewsa axakî 20 axa rabûn û her yek bi şîva xwe tajo.

Rewşa nû taybetiyên nû bi xwe re anîn. Berê çûn û hatina Kurdên Sovyetê, bi hev re, gelek bû, lê aniha ew têkilî di bin siha sînorên cuda re dimeşin. Ango, dema Kurdên Ermenistanê, Gurcistanê, Azerbeyjanê û Kazaxistanê li hev dipirsin, gumrik heye, sînor hene.

Gelek Kurdan, ji ber sedemên eborî, dev ji gundên xwe berdan û li bajarên mezin rûniştin. Erê, ji ber giraniya jiyana eborî ya îro, Kurdên me gihîştine hesta Sîbîrya yê ... û ez vî tiştî ne baş dibînim.

Gereke di rewşeke wisa de Kurd li xwe xwedî derkevin, da bi kêmanî hebûna xwe wînda nekin. Ev jî şertê herî sivike di rewşeke wisa giran de.

**Pirs** - Dr. Celîl, rengên xebata Kurdên Sovyetistana berê, di warên Kultûrî, civakî û siyasî de, çawa bûn û niha çawa ne?

**Dr. Celîl** - Ji ber siyaseta ya dewletê bû, kesî nikaribû ji derveyî vê yekê derkeve. Loma karê Kurdên Sovyetî jî di warê siyasî de tune bû. Anuka meydana siyasî, ji her kesî re, vekirî ye, lê mixabin ta nûka ti organîzasyonê (rêxiraweke) Kurdî tune ye, ku bi rastî vî barî hilde ser xwe, (belkî hin komik û organîzasyon li Rûsiyayê hene, lê bi rastî hê karê wan baş xuya ne bûye, û bi ser ne ketiye.

Meydana kultûrê berê xurtbû, û bingeheke baş li Ermenistanê hebû. Belê, heftê du caran "Riya teze" derdiket, pirtûkên mektebê (Dibistanê) çap dibûn (ji xwendekarên heta sefa "9" re), pirtûkên nivîskar û şafîrên Kurd çap dibûn, lêkolîn li ser Kurdan çap dibûn, lê ji ber dewleta alîkariyê nade, aniha hemû sekinîne, û tu organîzasyon tune bi vî barî rabe.

Di warê civakî de, civaka Kurdan weke civata dewletê, ew civat ji hev keitye, ji herivandina çê bû.



**Pirs** - Dr. Celîl, bêgoman. piştî hêrvitina welata Sovyetê gelek .. koçberî welatên biyanî bûn, û tu jî ketî bin barê vê koçberiyê. Gelo, sedeme koçberiya te çi ne ?. û projeyên te di vî warê nû de, çi ne ?.

**Dr. Celîl** - Gava me got : “civata Kurdî ket ...” civata rewşenbîrên Kurd jî pê re ket. Gelo, çima ev ketin ?.

Ji ber herivandina welatên Sovyetistana berê û çêbûna gelek komarên serbixwe, jiyana rewşenbîrên Kurd jî ber bi çetinbûnê çû, ew alîkariya dewletê jî nema, qimeta rewşenbîriyê daket, û taybetî ya rewşenbîrên Kurd, loma gelek rewşenbîrên Kurd warguhêz bûn, û ez jî yek ji wan bûm. Lê, koçberiya min ne reva siyasî bû, ne jî ji bo aboriyê bû, loma ez dibînim ku ez bi mêvandarî hêwirî Awropayê bûme, da ez karibim karê xwe yê kurdologî bimeşînim, ji ber min li Rûsya yan li Ermenistanê nikarîbû bi vî karî rabim.

**Pirs** - Dr. Celîl, we weke mirovekî rewşenbîr, têkiliyên rege rege, ji zû de, bi Kurdên Sûriyê re kirine. Ma hûn Kurdên Sûriyê di warên rewşenbîrî, civakî û siyasî de çawa dinirxînin ?.

**Dr. Celîl** - Ji sala 1982 an de ev çar çaran ez hatime Sûriyê. Gelek gavên xurt hatine avêtin, gelek pirtûk hatine weşandin û rê li pêşiya wan vekirî ye. Wilo jî, gelek kar hatine kirin, lê weke rexne, eger hevpirsîyara rewşenbîriya Kurdên Sûriyê hebûna, wê rewşa wan baştir bûya.

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn nivîsevanên Kurdên Sûriyê di hemû beşên wêjeyî (Roman, çîrok, kuteçîrok, helbest, şano, gotar ... û y. d.) çawa dibînin ?.

**Dr. Celîl** - Tevî pêşveçûna xuya di vê meydanê de kêmanî pirin. Karekî pir dibe, lê gelek qelsî tê de heye, nemaze di kultûra çapkirinê de. Diyar e berî nivîsandinê tekeve bin çapê de tedqîq nabe.

**Pirs** - Dr. Celîl, çapemeniya Kurdî, bi taybetî beşê lafî, li Sûriyê kevnar e. Hûn çawa vê çapemeniyê dinirxînin ?.

**Dr. Celîl** - Ez pêşeroja nivîsandina Kurdî li seranserî Kurdistanê elifbêya latîni dibînim. Helbet ev elifbê hê kamil ne bûye, nûavakirin jê re divê ji bo bersiva xwestekên me bide, û ev nûavakirin gereke bi destên pispor û zanyarên bilind bête çêkin.

Tipên Soranî ew jî parçakî kevnare ji kultûra me. Jiyandariya wê jî wê bidomîne çiqasî xelk pê binivîse ...

**Pirs** - Dr. celîl, hûn çi probleman di çapemeniya Kurdî de dipelînin, û riyên çareserkerina wan, li gorî behweriyên we, çawa pêk tên ?.

**Dr. Celîl** - Ez kêmaniyê mazin dibînim, ku rewşenbîrên me bona nivîsarên xwe zimanê devokî yê herêma xwe wek zimanê lîteratûrî bi kar tînin, heta ku hinek kes ferhengên dinivîsin, lê devokên herêmî di wan de rû didin. û hin cudatî di nav tîpan de li Awropayê û Turkiyê çêbûye, û ev tişteki pir ne baş e.

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn kovara “Pirs”ê, bi taybetî li Sûriyê û bi gelemperî di nav çapemeniya Kurdî de (beşê lafî) çawa dinirxînin ?.

**Dr. Celîl** - Gava min hejmara 7-8 an ji kovara “Pirs”ê dît, dilê min him şa bû, him jî êşiya. şa bû ji ber ku kovareke gelekî bi rêk û pêk, bi şertên çapkerina

Ewropî çap bûbû. Dilê min êşiya, ku kovareke rewşenbîrî wa hêja pir dereng gihişte destên min û haya min jê çê bû.

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn xweş dizanin, ku Kurdên Sovyata berê, berhemên hêja (di warê zimên û rêzîmên de, di warê zargotin û dîrokê de, di warê helbest û çîrokê de ... û di gelek warên din de) afirandine, lê ev afirandin bi tîpên kirîrî ne. Gelo, ti proyeyên we, yan jî mirovîndin hene, ku van berheman biguherin tîpên latînî Kurdî? Eger nebin, hûn çî pêşniyaran berçav dikin?

**Dr. Celîl** - Weke ez dibînim pêşeroja tîpên kirîrî tune. îro, ew ber bi mirinê ve diçin. Hin serhişkên kevneşop xwe bi wan tîpan girtine. Hin jî wan berhmên ku bi tîpên kirîrî hatî nivîsîn, hêdî hêdî têne guhezîtin û bi tîpên latînî der tînin.

**Pirs** - Dr. Celîl, hûn weke mirovekî pîspor di warê Kûltûra Kurdî de, çî dixwazî jî nivîskar û xwendevanên kovara "Pirs"ê re bibêjin?

**Dr. Celîl** - Weke ez dibînim "Pirs" kovareke yekemîn e di Sûriyê de, ku wa bi delalî û hêjatî çap bûye.

Daxwaza min a mazin ew e, ku hemû xwendevanên Kurd vê kovarê bikin, bi xwîn û nivîsarên xwe yê hêja jê re bişênin.

û jî kovarê re jiyandariya dirêj û guhdariya mezin dixwazim, ku şaşiyên zimên û tîpan di kovarê de kêm bin.

**Têbîn :** Rêdêksiyona "PIRS"ê lêborînê jî Pro. Dr. Celîlê Celîl û xwendevanên hêvî dike, jî ber ku ev hevpeyvîn jî zû de bûbû, lê jî ber nîrên taybet gelekî bi derengî hatiye weşandin.

## Têbînîyek :

Kovara "Pirs"ê lêkolîna Dr. P. Berwarî (pêşveçûna bizava...) ya ku di hejmara (14) de hatiye weşandin, bi payebilindî dinirxîne, lê xwe neçar, derbarî ronîkirineke sivik li ser kovara "Stêr", dibîne. Ew jî bi kurtî :

1- Jimara pêşî jî kovara "Stêr" destpêka sala Kurdî - 2595 der çû - Ango buhara sala 1983 an.

2- "Stêr" jî jimara 1.1983 tanî jimara 14.1989 li gorî formatên 32 x 21, lê jî jimara (15) tanî ya (20) li gorî formatên 21 x 16 derçû ye.

3- Piştî jimara (20) "Stêr" jî li gorî parçebûna partiya Hevgirtina Gel, li Sûriyê, bû du parçe. Yek jî wan piştî jimara (21) tevî kovarinê din "Pirs" damezirandin (li pêşgotina "Pirs"ê ya jimara (1) vegeer e). Yek jî piştî jimara (24) an rawestîya û tevî kovara "Bihar" bû, li pêşgotina "Bihar" jim (1).. vegeer e).

# Hevpeyvînek li Gel Hunermendê Teşkilî

## Yûsif Bekir

Jiyan tabloyeke, her mirovek, di afradina wê de, xudî par û hevpişke, her mirovekî nêrînek heye, dixebite da karibe şopa xwe di wê tabloyê de bide xuyakirin. Hunermand jî mirovekî xudî hestekî tenike, li gel bûyerên jiyanê dide û distîne, û di goşeyeke taybet re li wan bûyeran meyze dike, û hestên xwe bi alîkariya alavên hunerî (peyv, awaz, û per û reng) werdigerîne.

Yûsif Bekir yekeke ji gelek hunermendên Kurdên Sûriyê, per û reng di destên wî de alavên derbirinê nin, hestên wî, nalîn û axînen wî, armanc û hêviyên wî, ji perê wî dadirivin, di rengan re diherikin, û li ser kaxez û cêw nîgar dibin "Pirs"ê ev hevpeyvîn pêre hebû.

**Pirs** - Ji ber ku dezgeyên Kurdî nînin, û yên henin, ji ber hin nîrên taybet, qels û ajeqorin, afrînendeyên Kurd li nav gelê xwe nehatine naskirin. Vêca ji neçare em dê vê hevpeyvîna xwe bi pênasînekê dest pê dikin, û bêjin : Ji kerema xwe ger dikarî xwe bi xwendevanan bidî nasîn.

**Bersiv** : Li gundê Şêxbîla, yê ku li ser eniya çiyayên Kudaxê paldayî, rojekê ji rojan, zîkê diya min ez avêtim ser riwê zemînê. Li wî gundî ez bi çarlepan meşim, ta bi ser nîgan ketim, pişt re ez çûm bajarê Helebê, û bûm şagirtê (navenda Fethî Mihemed) ya ku min tê de hunera teşkilî xwend, û di dû re jî çûm şamê, û min xwendina xwe li Kolêja hunerên bedew (Kuliyet El Funûn Eljêmiye) kuta kir. Ez li hin şanogehan, li gel hin hevalên hunermend hevpar bûm, û min hin şanoyên dîtir, bi tenha, amade kirin, çî li Helebê û çî li şamê.

**Pirs** - Tabloyên te bi çî rengî distirên, ango çî reng li ba te nazîke, û cihê xwe di tabloyên te de fireh dike û cihê yê dîtir teng dike ?

**Bersiv** : Gundê min, wekî hemû gundên Kurdxê, bi zevî û daran dorpêçkirî ye, min jî yekemîn çar çavên xwe li wê de vera ciwan vekir, lewre keskayî û şîniya ku wan çiya û newalan diçerçiwîn e, û cilên jinên kurd, ku sibehan diçin nav dexl û rezan, dixemilîne, min ber ve xwe de dikşîn e.

**Pirs** - Reng û derûn, çî têkilî evan herduwan li gel hevdu dibestînin e?

**Bersiv** : Derûn li pêş rengan di ser hev werdibe, û dilerize. Bandûra rengan xwe berdide hindirê derûnan, û gelekî di wan hukar dike.

**Pirs** - Tu çawa liv û bizavê di tabloyên xwe de digerin ?

**Bersiv** : Ez dibînim ku ev liv di bîngeha mirovê Kurd de heye. Herdem



Y. Bekir

liva wî ber bi pêşe, û dilaneke geş û germ peyda dike û digerin e.

**Pirs** - Tu çawa livê di rawestîne de dibînî ?

**Bersiv** : Dema tu mirovekî rûniştî dibînî, kerbûnek, bêlivînek wî dorpêç dike. Lê di hindirê wî de bêzarî, xemxwarî, şoreş, û dilan û sema dikelin, û livek nexuya diyar dikin. Ev cura - liv çavekî jîr divê, ku karibe wê bibîne û bi dengkirin bide.

**Pirs** - Huner yekeke ji cureyên zanîne. Tu çawa vê peyvê bikartîni ?

**Bersiv** : Di berbanga zanistîya ademîzad de, mirov têgîha ku xwe bi awayê wêneyan, li ser lat û zivîngan, bide xuyakirin. Huner wênekî rastir bû ji dîroka nivîsandîne. Di dema niha de hunermend kari hemû nêrin û dîtînen ramanî, xişm û bêtaran di tabloyê de xuyabikira wek nimûne Pîkaso li ser xîşma gundê "Gernike" karibû bi hest û têgîhîştina xwe, bi tabloya "Gernike" bête naskirin, û di dil û malên Ispanîyan û cîhanê de bibe şaneka berze.

**Pirs** - Huner ne tenê cureyekî zanîne ye, lê ew ji bo xebata mirovane jî alaveke kêrhatî ye. Tu çawa vê alavê, di xebata xwe de, bi kartîni ?

**Bersiv** : Dema ez tiştêkî çê dikim, qeşengiyekê di çavên mirov de şîndikim, ew mirov li pêş tabloyekê radiweste, dibîne tê de zarokêkî belengaz digrî, hîngê dest davêje berîka xwe, û perena jê derdixe û dide zarokê tabloye. Ev bûyer dide xuyakirin, ku wê tabloyê hestê wî mirovî keland.

**Pirs** - Mêrg, kelepûr û pêmayên gelê Kurd li ba Yûsif Bekir çinin ?

**Bersiv** : Bingeha tabloyên min ji kelepûra gelê min diherik e. Kelepûr çavkaniyeke, ku reng jê diherikin, ez pê re diçim û tîm. Kulamên şivanan, çîrokên kalepîran, û pîrjinan, dastanên evîni wek Memê Alan, û Siyamend û Xecê, û yên lehengî wek keleha Dimdimê, û efsaneyên Kurdan, û şoreşên şêx Se'îdê Pîran û Barzanî û h.w.d. Tiliyên evan tiştan gîşkan li ser tabloyên min diyarin.

**Pirs** - Darên zêtûnê û çinarê li dorhêla çemê E'frînê, çawa bîra te ya hunerî dilivînin ?

**Bersiv** : Te got E'frîn, û dara zêtûnê, û çinarê. Ma çima nabêjî ewan darên ku me navên xwe, û zaroktiya xwe li ser kokên wan dinivîsandin, û digot: Ez hej te dikim dayê.

**Pirs** - Jin, jiyan, huner, çi radeyên wan di dilê te de henin ?

**Bersiv** : Ez her sêyan di hev de dibînim, her sê di giravekê de dijîn. Jin çiyakî dil germe, serê xwe datînim ser sîngê wê, da hêzek jê bibim.

**Pirs** - Te çi ol û rêbazên huner, dane ber xwe ?

**Bersiv** : Min ji kilasîkiyê de dest pêkir, û min gelek ol xwendin, da karibim xwe, di nav wan de, nasbikim. Min xwast taybetiyekê bidim hunera Kurdî, û kûr pê de herim.

**Pirs** - Rewşa netewa Kurdî, û kar û barên hunermendan, di nêrina te de, wê çawa bin ?

**Bersiv** : Dixwazim bibêjim, ku huner neynika şarîstaniya her miletekî ye, lew re dixwazim hunera Kurdî her pêşkeve. Lê mixabim rewşenbîriya hunerî li nik gelê me pir jare.

## Teqîna Derd û Kulan

Ax.... !

Hêsir û xwînê  
ji jana min tevilihev dibin.

Pênûsê min jê vedixwe,  
û xwe davêje  
xwedayên helbestê,

belkû

ordiyên peyv û wateyan  
bibin aligir.

Bi bombeyên ramanbihêz  
peyvan bikim şervan,  
bo şerekî giran  
jê agirekî gur  
bibafrînim  
serê bêhişan jêkim.

.....

Ey bêrîbvanên helbestan!..

Hûn baş  
birîbû janên min  
dinasin.

Dilbera min  
di navbêna  
neynûkên dêwekî de ye.  
Canê wê, yê gewr parçe dike,  
dide ber didanên gurên har,  
goştê min dixwin,  
xwîna min dimêjin,  
û hê dimêjin...



### Nasnameya Mihemed Nûrî Xûrîst :

- Ew helbestvanekî Kurd e, bi Erebi berhemên xwe di kovar û rojnameyan de, diweşîne. - Ji gundê (Maratê), ya herêma (Kurdax)ê, sala 1957 an ji dayik bûye. - Xwendina xwe bilind ji zanîngeha (Heleb)ê Fakûlta (Edebiyat)ê, bêşê edebiyeta Erebi, sala 1983 kuta kirî. - Li bajarê (Heleb)ê edebiyeta Erebi, xwendevanên lisê dide xwendin. - Li meha tîrmeha 1997 an, berhevoka wî ya bi navê (Kengî, ezê navê te aşkere bikim) derxist. Ev helbesta ji berhevoka wî hatiye wergerandin.

# Mirin

Di helbesta min ya dawî de...  
Li ber cobarek ji xewnan.....  
Min darek bi çuk nivîsand ...  
Pir nema ....

Dar mezin bû.....

Pir nema

Çivîkên rengîn  
Ji ezmanê giyan .....  
Li ser danişîn ....  
Û stiran !!

Di helbesta min ya dawî de...

Pir nema....

Min dît ku :

Nêçîrvanek....

Ji.....

Peyva...

Dawî....

Derdikeve...

Li mil

Tivingek bikêr

Di destan de...

Laşeyên çivîkan

Çivîkên rengîn...

Çivîkên giyan....





## Şikestina Dîlanekê

Min li ber  
derghê kelha dozê  
berbangek devbiken didît  
bişkivîn û keskesorek  
min di dît

Ji nişkave  
Ji pala pesarên vînê  
kêrek dihat  
bilindibû  
dizîzikî  
dihat

Û di cergê roja min de çikilî  
birînên hindir axivîn û keliyan  
li xab ket devê geliyan

.....  
Ariya sedsala cengê bû bablisok  
Soz û qewîtiyên pîran  
direvandin

Û kujtaran  
Biranînên xwe yên kevnar  
vegerandin

Û sehên hestî kevêj  
li ber latên "xwekujîye"  
girêza xwe nisilanidîn

.....  
Şevê dîsa  
Sawên xwe berdane devê penceran  
Dîlan û hofkên zarokan  
şikestin

Findikên cejnên çivîkan  
velîstin

Dema hawara dadiyê  
bihîstin

Li başûr ... li başûr  
Xak li ser termên xwe digrî  
Li başûr !!!



## Ez û Dilber

Bese dilber dipirsim ez  
    çi payetiy û qapane  
Dilê min va te sotiyî  
    jê dertê ar û dûmane  
Birinên min te kur kirne  
    çihêviyye çi dermane  
Dinalim ez şev û rojan  
    mi ah û qîr û fixane  
Ji qapana xwe dakev bes  
    li nêk te ew jî insane  
Delal û dil bijoke ew  
    ebîdê herdû lêvane  
Dû lêvên te jiyana dil  
    bi wana tim seranser tê  
Tû findek pir bi ronahî  
    xwe lê digre herû her tê  
Di çerxên asîman esmer  
    di şensê wî timî fer tê  
Bi sed rengî eger bavê  
    tû kevra timî dilber tê  
Kû ax b' destê Seyyid be  
    dibê qey vaye cewher tê  
Ji xwe Dilber gulokek zêr  
    li himber va serûser tê  
Serûser xweş terazû ye  
    jiyanê xweş di meşşine  
Kû dergakî fireh vedbî  
    xweşî hemmû li pey wîne  
Ebidê xwe tû azake  
    tû erkana bi cî bine  
Li nav baxê bihiştê Mem  
    li nêk Zînê ti wî dîne  
Bi hilma nêrgiz û lala  
    tû biskan lê bigerrî ne  
Himêz bik dilbijokê xwe  
    di warê dil gunch nîne.



Ey “PIRS”ê tu na pirsî KELEŞ ka li kû maye ?  
Wendaye, belâ wî girtine lew ne xuyaye.  
Êrîş birin ser wî, û kirin qeyd û kelemçê,  
heft rojên Temûzê ew di zindanê de maye.  
Halê wî niha pîr çetin û zar û giran e,  
vê germa havînê niha seyda hiliya ye.  
Wijdan va nema ye, ji vî kalî çî dixwazin ?  
Kovarê çima heta niha te deng ne daye ?!  
Ka rabe ji xew “PIRS”ê bo Seyda bike dengî,  
Seyda va li zindana tenê bê xwedî maye.  
Ey “PIRS”ê hewara me maye li min bipirse,  
ban kovarê Kurdî ke, ma qey namûs nemaye.  
Wek hovan pelendar bûn, li hundur kirin gêre,  
her tişt kirin vajî, û li rastê wek xwe maye.  
Ev bexçe û baxên me birin tev kirin talan,  
çîçek û kulîlk tev peritandin ev buhaye.  
Êrîş birin raman û şiyarî, ev çî hale ?  
Ev kufir û ziyana eşkere ka li ku maye ?!  
Ajan ji me Kurdane û em wan tînin ser xwe,  
ta kengî emê wa bin, me namûsa xwe daye ?!  
Destê me li karê me kirin sist û li ser hev,  
hew zanim ji kû destpê bikim, li dest çî maye ?!  
Ey “PIRS”ê tu dengê xwe bide bajar û gundan,  
Kovara me kurdayî çima bêdeng tu maye ?  
Bawer me dikir ku tê bi xurtî dest hilîne,  
va îroj dibînim te li ber xwe qet nedaye.  
Gazindê dikim, ne ez tenê girtî û bend im,  
pîr Kurdên welatparêz di zindana de maye.  
Loman ez dikim ji kovarên Kurdî bi carek,  
dengê wan ji bo KELEŞ li der dê ne xuyaye.  
Ez dostê kovaran tevanim bi rastî û rohnî,  
dostayî ne waye, va îroj bi min xuyaye.  
Wek ba û birûsk im li neyarê xwe dixînim,  
ez çî bikim ku serdeste neyar li ser me maye.  
Heft caran me paldaye li zindana ji bo kê ?  
Ka kovara Kurdî wê li derheqê me çî daye ?  
Me ling û serên xwe xiste dolaban ji bo kê ?  
Tevger ka ji bo çî ku ji bo me deng ne daye ?  
Serjêr ku em daleqandin kehreb ku didan me,

kovarên me Kurdan vê nebêjin ma çewaye ?  
Her yek ku ji bo gel têkevî zindanê dijmin,  
kovarê divê bêje va soza xwe te daye.  
“PIRS”ê tu bipirse, tu kovara gelê Kurde,  
ger ku tu ne pirsî ka destê me çi maye ?  
Hêvî me heye ku tê bibî dermanê derdan,  
zanim tê bi xurtî dest hilîne ev wihaye.  
Heqê me heye ku ji şewatê vê dibêjin,  
kêmayî ne baş in û li ser me ev buhaye.  
Barê me nema girane em hatine meydan,  
Kurdên me wê tev bibin piling û ejdehaye.

.....  
Kes êdî nikare bibêje sika we xware,  
serê me bilind bûye gihaye ber xwedaye.  
Enfalan ji Kurdan êdî kes nikare çêke,  
doza me ji zûve ev bû, ev bo me buhaye.  
Gel tevde dibêjin va gelê Kurd hate holê,  
herkes vaye destê xwe didî me bi me şa ye.

Kes êdî nikare me bitirsîne bi zindan,  
ey Kurdo bese rabe tu kêmayî nemaye.  
Destên xwe bidin hev û li her der bikne govend,  
mizgînê didim Kurd va tu bê xwedî nema ye.  
Destên xwe didin me hinera xurtîr ji herkes,  
wê kî karibe bêje gelê we paşdemaye.  
Xwena me berê sibê bû rojava dikî derbê,  
finda me bi avê vêketî armanc xuyaye.  
Em îro dikarin bi xurtî dengê xwe rakin,  
kes êdî nikare bê Kurdo gufta te wa ye.  
Lingê xwe li erdê xin cîhanê bihajînin,  
piştê me qewîn bûye li vê dema niha ye.  
Ev dem ku nehata wê neyar em bi xwarana,  
halê me li destê wan nema bû ev xuyaye.

.....  
Neyar ketine hev û li hev tev kerr û gêj bûn,  
rêçek ji bo çarê va li ber wana nemaye.  
Heyfa xwe bi destê xwe emê rabin hilînin,  
xefka xwe li ber dijmin ji zûve me vedaye.

Kurdên qehreman derba wî xweş hatiye ber wî,  
kaşo va bi destê wî ye, dem jê ve xuyaye.  
şingînê wê jê bîne eger ku kî li ser be,  
kîna sedê salan va di zik de vedaye.  
Em xwarin û xurt bûn û li ser me bûne paşa,  
îroj divê verşin vaye Kurdê me giha ye.  
Baş zanin ku Kurdên me wê rêça xwe bibînin,  
hew karin welatê me bixun, xwedî wî vaye.

## “Mar dûvê xweyî qut ji bîr nakê”

Çi hebû, çi tine bû....

Şivanek hebû baş li bilûrê dide, pezê xwe di nav bêlanek fireh û mezin de diçêrand, li dor qûçek ji keviran, di wê qûça keviran de marek dijiya. Her roj şivanê bilûrvan ji wî marî re li bilûrê dida, mar jî her êvar zêrekî zer dida şivên. weha demek dirêj bi vî awayî derbas bû.

Rojekê şivan li ser rêye, ku here bajarekî dût, bang li kurê xwe kir û jêre got :

- Kurê min, mar di nav wê qûçê de heye, hal û hewalê min û wî eve, ... Her roj zêrekî zer dide min, qet tu nêzikî wî marî nebe.... û wiha pir şîret li kurê xwe kirin.

Piştî çûna bavê, kurê şivên şûna bavê xwe girt, û bû şivan, û wek ku bavê wî şîret lê kirbûn weha dikir, her rojê ji mar re li bilûrê dida û zêrekî zer ji xwe re tanî malê.


Rojekê dūdilî bû, di orta xwe û nefsa xwe de, got; Çima ez vî marî nakujim û wê xezinê tev ji xwe re nabim malê?.

Rojek ji rojên bihara rengîn, piştî koçkirina zivistana xemgîn, mar bi kêfxweşî ji qula xwe hat der û li hember şivanê biçûk rawestiya, da ku li bilûra wî seh bike, di wê bîstikê de şivanê biçûk, ew kevîrê ku di destê xwe de veşartibû, ji nişkave, û bi hêz avêt serê wî marî. Bi wê avêtina kêvir re dûvê mar hat birîn, lê mar bi dilêşî li şivên vegeriya, û pêveda û ew kuşt.

Êvarî pez bê şivan vegeirî mal. Dema diya şivên dît ku pez bê şivan hat, rabû xeber da mirov û cîrana, wiha li şivên geriyar ta ku dîtin va şivan miriye, û mar pê veda ye, rabûn ew anîn mal û di mezêlê gund de veşartin.

Piştî demekê şivanê mezin zêvirî mal, bihist ku mar bi kurê wî vedaye, û ew kuştîye. Ew gelek li ber kurê xwe ket, piştî çend rojan berê xwe da qûça keviran, ya ku mar tê da-dijî, û bi dilêşeke xemgîn li bilûrê da, lê mar zû bi zû xwe ji qula xwe neda der, ta ku roj qulipî danê êvarê, hingê ji nû marê birîndar û dûv qut serê xwe ji qulê deranî, û li şivanê mêze kir, û zêrek bi serda avêt û jêre got :

- Bira ti car din neyê vira, ji ber ku ne tu kurê xwe ji bîr dîke, û ne ez dûvê xwe - ye qut ji bîr dikim.



1915. Du caran yek e. Her carekê bi navê yezdan ê dilovan. û sê caran sê-sê, carekê bi hersê pirtûkan, cara din bi hersê pêximberan, û cara paşin bi navê miletan. Lê di dawî de pênc in. Qalûç di destê xwedê de, li ber zeviyê zer sekiniye, bi her avêtinekê re pênci serî difirin û careke din xak di xwînê de tê gevizandin.

1915. Dîrokeke reş e mîna riwê xweda. Sala şermiyê ye di eniya bablîska bîstan de, xwişka mezin e ji sala 1988 an re. li evê derê em du caran, di nav bera heft û nehan de, di bin sîka hersê sêyan, û yekî din de, hatine şewtandin. Di roja ku, bi nav gund ket, di ro- nîvro de, seg nêwîn. “Ev yeka ji nîşanên roja heşer- meşerê ye”. kale- mêrên holê gotin.

Piştî ku, çend malên pêşî birî bûn, di gedûka mala me de ket. “şêş roj û heft şevan ji xewa giran şiyar nebû. Di sê rojên pêşî de, kes ji gundiyan me nemabû ku, tiliya xwe di meselê venekiribû, lê bê sûde. Ew ji xewa tirs û kuştinê şiyar nedibû. Dawî yê de, pîreke gund fermana jêgera wî da û got: “Eger heft çilpikên xwînê yên di sipîka çavên wî de ziwa nebin, ewê ji xewa mirinê şiyar nebe”.

Heft- heft pirtûk, heft qatên ezmên, heft pirtûkên quranê, tev şeşên şewitandî; Osmên fermana kuştina wan da bû. Heft rojên heftiyê, û heftiya mirinê. “Bi heftê û heft xweda û bi pisîka bi heftcana eger ev heft çilpikên xwînê ziwa nebin, ewê şiyar nebe”.

Eve gotina pîreka gund, û tev jî dizanin ku gotinên wê ji yên xwedê ne; cihê pîroziyêne.

Piştî “şêş rojan û heft şevan” ew şiyar dibê. Xwe di nav komek jin û mêr de dibîne. “rih bûye bost lê dijmin ê ne be dost”. Li der dora xwe dinêre. Heft çilpikên xwînê di nivê odê de ji çavan di weşin, û heft termên zarokên ser- jêkirî şîn dibin.

Di wê şevê de civakeke fereh li odê digere, heya dengê mele û dikan jî, nikarin ewê civakê ji hev bixin. Rê û rêçik pîrbûn, dîroka herêmê tev hate hilweşandin û tevdan. Lê mêvan ê me bê deng dima, kesên rûniştî çend caran xwestin wî ber ve xwe bixşînin, lê dest vala vedigerîn.

Gava wan bawer kir ku, rûniştina wan bê kêr borî bû, ref bi ref belav bûn. min jî xwe di qancekî odê de lûskiribû; ez bi çavên mêvanê me diramîm ku, çawa yek dikarê çavên xwe carina kesk bike, cara din şîn û carina jî reş, û di nav bêna her çendekî de kevokekê jê bifirîne.

Dema nîvro ji xew şiyar bûm, min mêvanê xewar li mal nedît. çend caran ji diya xwe pirsîm, lê wê bi kurtî li min vedigerand “mêvanek bû û çû gundê xwe”.



Evê bersivê ez têr nedikirim. Mêvanek şeş rojan raze, û di roja heftan de wînda bibel!

Bîst û yek sal di ser hatin û çûyîna mêvanê me yê xewar re diçin; ew ji bîr dibe, lê carina mîna çîroka Erebe tirkirî gundiyan ew mêvan û xewa wî danîn zimên, nemaze di demên ku, yek daketa kaniya jêrî gund û xelesa wan heft darên ku, bi destê wî hatibûn çandin bidîta. "sed rihme li tirba Agop be, ev bû çend bav û bav li vî gundî çûn û hatin, lê kesî ji me bîr nedibir ku, rojekê şiqnekî bîne û li vir biçîne. Em miletekî ziwa ne". gundiyan lome ji hev dikirin, xasma di demên ku li ser kaniyê, di nav sika heft darên çinarê de yên ku kesî nizanibû Agop ji ku anîn û li vir çandin, rûdiniştin.

Di dû van salên dîr- dirêj de, ezê pir tiştan ji zarokiya xwe wînda bikim. Yek jê çîroka Agop, lê di rojê sar de ku, heft şurik bûne yek, emê pêrgî hev bîn. Hingê min xwendina rojnamevaniyê kuta kiribû û li civînê bi cih bûbûm.

Di sibeyeke zivistanê de berî ku, ji mal derkevim zengilê telefonê lêda. Gava min xîst ber guhê xwe de, li aliyê din dengê hevala min a rojnamevan hat. Bi kurtî û dengekekî tijî hêsir got: Hevalekî me rojnamevan bi destê (Mîr) ê Tirkan hate kuştin.

Bi destekî sar û dilekî kizirî min telefon girt û bêyî ku, qehwa sibê vexum, min cixareyek xitse nav lêvan û derketim çûm goristana ku ji min re bi nav kiribû. Bi rê ve pir wêne û bîranîn di ber çavên min re borîn, nemaze karên ku, wî ji bo Kurdan de dikir, û çawa hovîtiya ceneralên Tirkan tazî dikir. Piştî ku, ez gihîştim ber deriyê goristanê min bîr bir ku, min soza veşartin û amedeya ser gorê nebiri û rê nemabû ku, careka din telêfonê jê re vekim, û zanibim ewê ji kîjan kenîştê bi derkevin, lewra divyabû li benda wan bimîn.

Di kêliya, ku min xwest ez herim di teksiyê de rûnim, çavên min bi wî ketin, kale- mîrekî heftê salî, li ber her gorekê disekine û gulên wê av dide- Tîpê mirovê rojhilat xûyaye- dema wî li min nihirî du çem xwîne herikîn hêşt, ku destê xwe jê re hilînim, ew berkenî bû, ber bi min ve hat deriyê goristanê li ber min vekir.

- "Mirin tehl e, lê divê yek wê nasbike da, ku zanibe jiyan çi qwasî jehr e". Ji kûraniyeke bê binî gotinên wî der diketin. "Tu karî qurnefilekê ji wê derê jêkî". Gava dît, ku ez dest vala hatime, tiliya xwe ber bi hevzoyê qumefilan dirêj kir û gote min.

- "Te sipas dikim, derketina bi lez û ev nûçeya ji nişkêve hêşt, ku ez xwe ji bîr bikim". Min xwest ez hatina xwe ya bê baxê gulên ji xwe û wî re bin cil bikim.

- "Şîna dawî be lawê min".

- "Ne bawerim".

- "Ka em herin hundir". Kuştina minrovekî; di bajarekî Ewropa de, ê bihêsta mirov bi behite.

- "Tu bi tena xwe diji". Ev tiştêkî pir normal bû, lê min xwest ku, ez ji nuh ve deziyê axaftinê bikîşînim. Pirs min refek hecîleklekan ji çavên wî firand, nemaze piştî ku pê haybû çima hatime vê derê.

- "Ev bû bîst û yek sal û heft meh kêm sê roj, ku ez bi tena xwe dijin". Ev dîroka hûr hêşt bi min bide naskirin, ku çîrokeke dîr- dirêj li pey wî heye.

- "Xûyay e ku tu ne siwêsrî yî".

- Tu jî wekî min î. Nayê veşartin, ger em çiqas jî kurkên wan li xwe bipêçin, nîrîneke hûr li çavên yekî ji me, tu yê nasbikî ka tîna rojhilat di dilê wî de dileke lê na".Berî ew rûne ber bi quncekî odê ve çû; du piyalên mey- vexwardinê anîn. "Di rojek mîna îro de, tişt bi kêrî mirov tên: Pîrek û enbît". Bi gotinê re wî piyalek danî ber min.

- "Hejmartina rojan jiyaneke tehl e". Qurta enbîtê gewriya min kizirand.

- "Eger mirov lawê miletekî, ku. melyon û niv melyonê mirovan di navbera roj û şevekê de winda bike, be.

Ewê li benda rojekê be û teneyên tizbiya dirokê bêjmêre. Lê mixabim xûyay e temenekî bi tenê ne besê yekî ye, ku bigihe wê rojê".

Piyala enbîtê ji ser lêvan vala vedigere. "mîrovê Ermen ji bo tişteki tenê dijî; ji bo ku bîriya wî neyê ziwa kirin".

Piştî demeke ji bêdengiyê û çend piyalên enbîtê, wî dest avêt hundir sandoqekê û solek zarokan danî ber min. "Salên wê di salên koçkirina miletekî deye. Tu dizanî, ku êşa miletekî nîşan dide.

Ev teka sola zarê min ê herî bi çûke, ew mîrasê min ê bi tenê ye, ku li şûna malbata min mayî. Ji berî, ku meleyên wan bang bikin ew ketibûn gund û xwestin ji berî, ku ronahî belav dibe em ji gund derkevin.

Kesî nedizanî ewê berê me bidine kû derê. Heft zarên min hebûn, lê îro solek. Me gote wan, ku sultan bavê me ye û stûyê me jêre kopri ye, lê gotina me bê kêr bû. Bi rê ve çend siwar rastî me hatin û pîreka min birin; ez û heft zarokan sêwî hêştin, lê piştî çend gavan û giriyê pîrekê vegeirî û zarê, ku sola xwe ji min re hêştîye birin. Wilo çêtirbû, wan nexwest ku ez barê xwîn û kuştina wan jî hilgirim; hinekî xaçê min sivik kirin.

Bi rêva zikê şeş zarên min ê mabûn qelaştin, lê zêr di zikên wan de ne diditin. Her ku min digote wan zêr di zikê min de hene, ew dikeniyar û digotin hûn Ermen pêlewan in, tu wilo nakî.

Eger zêr hebin wê di zikê van zaroyan de bin, û kêrên xwe dişandin nav rovikên wan. Min heya bi demekê fêm nekir çima ez nekuştim, lê gava ez bi xwe re birim (Van) ê û destên min xistin xelekên zincîra, ku heya bi (Bon) ê diçe min nuh fêm kir, ku em êzingên dojeha wan in. Bîst û yek sal û heft zaro kêr sê mîlet kî dizane ew çî ye? "Belê... diroka solekê ye".

Gotina wî bi girî û lertzîna laş diçe serî. Minê bihêšta ew devê kanî û şikeftên ku, bi çemento girtine hilweşîne, û mar û dûpişkan ji sîngê xwe bi revîne. Lê dîtina wan çilpkên, ku yeko- yeko ji sola di nav tiliyan de dadirivîn ser sîngê wî, hêşt ez ber bi wî ve herim... û herim bêyî, ku karibim gava di nav me de bibirim û bigihêim wî.

Ez ji odê, derketim. Sibeyeke sar e. Di welatekî bê xem û solên birîndar de, ka mirovekî kuştî; mirovekî tazî, xewn windakirî, wê çibike, ji bilî ku li benda rojekê bi mîne.

Bîst û yek sal, ji berî vê dirokê ez hîne zaro bûm; di şeveke sar de, mîna îro, ez di qunceki puxarê de rûniştibûm û min li çavên mêvanê me dinihirî, belkî evbû!

# Goristana Welêt!?

Sibehê meçe çiyê êzinga! va dengê qupe qupa tifeng û temetika tê!. û derve ji pîr sare îşev, ku ez ne şaşbim ev şev şeva berfê ye! Pîra Menco berî ku razê ji Bîrhê re got!.

Bi sehara serê sibehê re, şiyarbû û berî ku pîra Menco şiyarbê û nîska sibehê jêre pêşkêş bikê, û hinek mewjî û beniyê hejîra berdê binê turê wî, weke her sibeh!. Rabû û berê xwe da çiyê ku barek êzing binê û bibê bajêr bifroşê!?

Bîrhê di payîza dawî ji temenê xwe deye, lê hîna bi dar û bere, werîs û turik li milê wî ê çepê ne û di destê rastê de jî bivirê wî ye, kû bi salan herdiwan qeysa xwe tede çêkirine!.

Ji gund dûr di keve û ber bi çiyayê bav û kalên xwe de diçe. Berf hûr hûr dibarî û xwe li pozê Bîrhê dida geh li rast û geh li çep.

Gavên xwe sivik kirin û di ber re jî lawikî xortanî : - (... Bavê Fexriya swarê Gêncî torinê malê, dinya ewre .. e. e. Lê nabê Saif.. Hawar delal ... Lê midî li bavê Fexriya rabû bû Tabûra Sêrtê sê A'layî!.. ) bi kêf di got û di lezand, berî berf xakê bigre.

Kete nava çiyê û rêk li xwe fitilandin û ji xwêre got: Îro ezê rîya xwe nêzîkbikim û ezê herim wî rexê jorî, ji mêj ve min êzing ji wêdê nanîne!. Çend darê hişkbiyî li wêdê hene!. Çaroxa lingê wî pelê weşandî ji dara diperçiqandin, û li rûbarî keleşan berxwedan dikir da lingên xwediyê xwe ji brîndarî yê biparêzê!? Ji nişkave çavên wî li dilopên xwinê diketin!.

Di cihê xwe de rawestiya û bi tîrs li hawîr dora xwe nerî û hêdî hêdî dilopên xwinê ku li ser pelên dara hişkbiyî dihat, rahişte pelekî dedwa û li pey şopa dilopa çû, dilopên xwinê hin bi hin gelectir dibûn!. Şîneke kûr kete dilê wî de û bi sistî gavên xwe bi pêş ve didan... Di wê gumanê de nalînek hate guhê wî!, gelo ev nalîna kêye!? ji xwe re dibêje. Ber bi pêjnê de çû.. Hêzê mêraniyê di damarê enya wîde cih girtin û bi lez rîya xew di nêv şax û pelên dara re vedikir û li pey xwinê diçû!. Li ber latekî mezin Bîrhê laşek di nav golek wxîn de dît!. Bejna bi şal û şap, Rext û fişeka girêdayî, ji xwinê sor bûbû... Bi lez xwe gihan ber serê wî.. Destê xwe di ser çav û enya wî re bir ku xwinê ser wan bidê alî!.. Xwîn hişk bûbû!. Tû kiyî û navê te çiyê? Kalo jê pîrsî. Bi zarekî sist û cemidî... E.. zim .. W. E. LAT .. kurê .W.. E.. L.. A..T..!? Û bi van herdû gotinan re zarê wî nema liviya! û ew gîyanê pakrewan diyarî Welatê xwe kir!.

Bîrhê çavên wî girtin û bi melûlî li berqefa latê jê re gorek kola û ew tê de bi cih kir!..

Bivir, tûrik û werîs avêtin ser her du milên xwe û bi valayî vejeriya ber bi gund ve. Bi dil şikestî digot ... Wey Axa ...oo!.. Wey Axo.. oo!.. Yek jê Cemilê Seydaye wê salê bêlok Mihû dikirin çawiş davêtin avê oo..!?

Ezê bi simê miqrê bi kurra bangokê bi xopana tinatê diketim ji êvara xwedê da bi hejîra!.. Bejna welatê delal, bejna şalan û şapika, rexta û zincîra ...

# Rûpelê Zarokan

## Mendalên delal ...

Kovara "Pirs" wê ji vê hejmarê û pê de rûpelekî ji we re veke, ev rûpel wê bi pênûsên zarokan bête dagrtin. Di vê hejmarê de, hevalê we (Salar) wê hin çalakîyên xwe ji we re pêşkêş bikê. Va ye nameya wî ji kovara we re:

Serkarên kovar "Pirs"

Silavên ger û hêviyên pêşketinê...

Navê min Salar e. Ez yazdesalî me. Ez ji pola pêncê derbasî pola şeşê bûme. Dixwazim bibim endamê kovara "Pirs"ê. Ezê gelek tiştên xweş ji "Pirs"ê re rêbikim. Ez gelek tiştan zanim, lê bavê min jî soz daye min ku alîkariya min bike.

Dîse rêz û silav û hêviyên pêşketinê.

Ji çalakîyên Salar :

### 1- Mijûlî :

Kî di kare sê caran li ser hev bêje :

A- Heft teşt tijî mast.

B- Rovî li rê fitilî, Rê li rovî fitilî.

C- Kerê boz li zirdê zirî.

### 2- Metelok :


A- Dostanî germa germa, dijminayî nerma nerma.

B- Ne sala du bihar, ne pîra bi guhar.

### 3- Têdêrxistinok :

A- Sê nig sê do, çar nig pêdo, du nig hat û hingek lê do, çi ye?

(Eger we têdêrnexist, li jêr binerin).



## Daxuyanî

### Li Ser Damezrandina Xelata “Osman Sebrî”

Di roja 09.01.1998 de sêminarek ji aliyê hin wêjevan, rojnamevan û hunermendên kurd ve, li mala Osman Sebrî li şamê pêkhat, daku bûyera buhartina 93 salan di ser roja bûyîne re, ya helbestvan, zimanzan, wêjevan û têkoşerê kurd Osman Sebrî careke din were pîrozkirin û avakirina şewazekî rûmetiyê jibo kesayetiya Osman Sebrî bête gotûbêjkirin.

Paşê pêşinyaza damezrandina xelatekê bi navê “Xelata Osman Sebrî, ya rêzdar” hat kirin. Ev xelat dê her sê salan carekê jibo kesekî were pêşkêşkirin, yê ku xizmet û xebatên hêja û giring ji bo gelê kurd, di warê ziman, wêje, dîrok, huner, şaristanî, politîk yan mirovatîyê de kirine.

Ev pêşniyaz ji aliyê hemû beşdaran ve bi dilşadî û bextiyarî hat pejirandin. Jibo vê yekê biriyar hat girtin, ku komîteyek ji heft kesan, bi serokatîya mamosta Dr. Jemal Nabez, bête avakirin. Dema ku komîtê pêwendî bi Dr. Jemal Nabez re li Berlînê kir, wî pêşniyaza komîtê zor sipas kir û amadebûna xwe ji bo vî karî diyar kir. Beşdarên şahiya damezrandina xelatê vê diyariyê ji bo kesayetîya Osman Sebrî layiq dibînin, ji ber ku têkoşerê kurd Osman Sebrî wek helbestvan, zimanzan, nivîskar û politîkvan xebatên xwe bi niştimanperwerî, lehengî, dilsozî û bi rastîyeke nîmûnedar, him bi gotin û him jî bi kiriyar pêşkêşî gelê Kurd dikine.

Jiyana Osman Sebrî, yan jî Apê Osman, yê ku cemawerê kurd jibo hezkirina xwe ya mezin jê re “APO” digotin, rêzeke dirêj û dijwar e ji fidakarî û têkoşînên bi serbilindî û bawerîyeke rasteqîn jibo netewa kurd, ya bîndest.

Em dixwazin beşekî ji vê jîyanê bi awayekî kurt bidin naskirin :

Osman Sebrî di roja 07.01.1905 de, li gundê Narincê, girêdayî navçeya kaxtê, li bakurê Kurdistanê bûye. Bavê wî serokê êla Mêrdêsiya bû. Dema ku Osman Sebrî hên zarok bû, bavê wî sala 1915 çû dilovaniya xwedê. Ew li ba apê xwe, yê ku bû serokê êlê, mezin bû.

Dema ku Osman Sebrî 18 salî bû di dibistana Rişdî, ya leşkerîya Osmanî de dixwend, wî welatparêzê Kurd yê nasdar Îsmayîl Efendî nas kir. Bi vê naskirinê re Osman Sebrî fêrî niştimanperwerîya resen bû, ya li dijî serhişkiya malbatî, êlperestî, navçeprestî û tengdîtina partiyetî. Osman Sebrî di sala 1922 de xwendina xwe li dibistana Rişdî qedand.

Piştî rûxandina şoreşa kurdî bi serokatîya rêberê Kurd yê mezin Şêx Sehid Pîran, Osman Sebrî jî digel herdu apên xwe Şukrî û Nûrî sala 1926 ji aliyê zordestên tirk ve hat girtin û zindankirin. Herdu apên Osman Sebrî si zindana Amedê de hatin daliqandin. Lê Osman Sebrî du salan di zindana Denzilê de, di bin kotek û ezibandîne de ma. Piştî effîyeke giştî, sala 1928, Osman Sebrî serbest bû.

Sala 1929 careke din Osman Sebrî digel 26 serokên êlên kurdî hat girtin û ew ji aliyê dadgeheke leşkerî ve li Meletiyê, li Bakurê Kurdistanê, bi sûcê amadekirina şoreşeke kurdî ya nû hatin darizandin. Lê Osman Sebrî, vê carê, zû hat berdan, ji ber ku cîgirê dozgerê giştî, Husên Husnî yê kurd, alîkariya wî kiribû û gotibû : “**Ez dizanîm, ku ez wezîfe û jiyana xwe dikim bin rîzîkoyeke mazin, lê dîsa jî ez dixwezîm alîkariya te bikim, ji ber ku ez bawer dikim, ku tuyê kanibî xizmeta gelê me bikî**”.

Texmîna Husên Husnî rast derket û daxwaza wî pêkhat.

Di 24.12.1929 de Osman Sebrî direve Sûriyê, û du salan dibe endamê Partiya Xuyîbûn ya Kurdî. Wê çaxê Sûriyê di bin nîrê kolonyalîsta Fransî de bû. Di 01.07.1930 de Osman Sebrî vedigere Bakurê Kurdistanê, da ku ew alîkariya şoreşa Agirî bi serokatîya Gêneral Ihsan Nûrî Paşa bike. Pişt re ew neçar dibe, ku xwe li ba êlên Inizan li ser sînore Tirkî -

Sûrî veşêre, heya ku karîbû dawîya salê jî wê herêmê derkeve û ber bi girên Barzan ve; li Başûrî Kurdîstanaê biçe. Lê ew li wê derê jî bi fermana kolonyalistên Brîtanî di gulana 1931 de lê girtin û li Mûsil û Bexdadê tê zindankirin.

Di hizêrana 1931 de Osman Sebrî tê berdan. Lê ew naçar dibe, ku xwe be erebên rewend li tilgelê veşêre, Piştî ew diçe Aman û Felestîne û heya sala 1935 li wê derê dimîne. Sala 1936 ew vedigere Sûriyê.

Lê kolonyalistên Fransî wî digirin û sirgûnî girava Medegeşker dikin. Sala 1937 Osman Sebrî tê Libnanê û sala 1938 ew careke din vedigere Sûriyê û dest bi fêrbûna zimanê kurdî li klûba Selahîdîn li şamê dike. Navê klûbê berî wê demê “Klûba Kurdistan” bû. Di wî warî de Osman Sebrî heya bi sala 1941 xizmetên heja pêşkêş dike.

Heya sala 1943 Osman Sebrî digel hin rewşenbîrên kurd, wek Cegerxwîn, Reşîdê kurd, Dr. Ehmed Nafîz, Qedrî Can, Memdûh Selîm û Celadet Bedîrxan beşdarî di weşandina kovara “Hawar” û “Ronahî” de dikir.

Sala 1954 Osman Sebrî alfabetû kurdî ya latînî weşand û hin pirtûk danîn, mîna **Bahoz, Derdên Min û Çar Leheng**. Pir helbestên wî, yê ne çapkirî jî hene.

Sala 1956 mamosta Jemal Nebez hat serdana Osman Sebrî li şamê, da ku ew bi hev re hin rêfoman têxin alfabetû Kurdî ya latînî û careyekê jî bo rastnivîsê di zimanê kurdî de gotûbêj bikin. Ev xebat gaveke giring bû ji bo bilêvkirina tîpên latînî li gorî dengên kurdî. Her wiha ew li ser bingehên avakirina civateke zanistî ya kurdî jî ji bo dawerojê peyvîbûn.

Di sala 1957 de Osman Sebrî di gel hin niştimanperwerên Kurd, bi awayekî çalak beşdarî di damezrandina “Partiya Dêmoqrata Kurdî li Sûriyê” de kir, û ew wek sikritêrê Partiyê hat hilbijartin. Osman Sebrî ev berpirsiyarî pir salan rakiribû ser şanê xwe.

Di dema yekîtiya Sûriyê û Misirê de, bi serokatîya Jemal Ebdîlnasêr û li gorî fermana kolonêl Ebdîlhemîd Eserac sala 1960 Osman Sebrî tê girtin û heya sala 1962 tê zindankirin. Piştî re ew direve Bêrûtê û heya sala 1963 li wê derê dimîne.

Di şeva 23.05.1964 de Osman Sebrî digel hin hevalên wî di Parîyê de li Helebê tê girtin û heya dawîya wê salê tê zindankirin. Di 24.06.1969 de, piştî ku dîsa fermana girtina wî tê dayîn, ew hewil dide, ku derbasî Bakurê Kurdistanê bibe. Lê mixabîn derketina wî ji Sûriyê ne mumkin bû. Piştî, heya ku çû dilovaniya Xwedê, ew tim di bin rûniştina zordariyê, kontrola polîsan û çavdêriya karmendên parastîne de mabû.

Bi şeweyekî kurt em dibêjin, ku Osman Sebrî ji sala 1926 heya sala 1973 hijde caran hatiye zindankirin. Wî bêtirî 12 salan jî jiyana xwe di girtîgehan de qedandibû. Du caran fermana kuştîne li dijî wî ji aliyê dewleta tirk ve derketibû. Ew sirgûnî girava Medegeşker, li Afrîka bibû, dema zordariya kolonyalista Fransî li Sûriyê. Karbidestên Sûrî jî rê nedabûn Apê Osman, ku karê xwe yê sakar di bûroya zadê de (mekteb elhibûb) li Cizîrê bidomîne. Ew sala 1948 bi fermana wezîrê hundirî jî karê xwe hatibû dûrkirin.

Apê Osman pir giringî dida fêrbûn û fêkirina zimanê kurdî. Wî pir nîfş jî xort û keçên kurd fêrî zimanê kurdî kiribû. Ew zimanê ku ji demeke dûr ve qedexekirî ye.

Apo ev rêya xebatê, di bin hemû mercên dagirkeriyê de, didomand heya ku bû 89 salî û xizmeta gelê kurd bêtirî 70 salî kir.

Roja duşemê, 11.10.1993, Apo çû dilovaniya Xwedê. Ew li gundê Berkevîrê, nêzîkî bajarê Dirbêsiyê, bi ahengeke mezin jî cernawerê kurd di tirba xwe de hat raketin.

Silav û xweşî ji bo roja bûyîna Apo û ji bo roja çûyîna wî. Ew pir serbilind bû û xweşewîst bû li ber dilan.

**Berfîn sala 1998.**

*Komîta ji bo Xebata Osman Sebrî  
Serokê Komîtê  
Mamosta Dr. Jemal Nebez*



## Tûrik ê Pirs ê

### Xwendevan û nivîskarên birêz!

#### Dema we xweş be:

Careka din, "PIRS"-a we bi we re ye, hemû berhem û nameyên we wergirtine, rêz bi rêz û tîp bi tîp ew xwendine, nerîn û rexneyên bo pêşveçûna wê di durv û naverokê de ketine destên wê, û bi tevayî, cihê rêz û sipasiyê bûn, hêvîdare ku ew têkilî û evîna di navbera we û wê de mestir û geştir bibe.

- Nameyek ji helbestvan Ferhadê Içmo û nivîskar Konê Reş gihiştiye kovarê, bi zarzimanekî xweş û berpirsiyar li ser berdewamiya derçûna "PIRS"ê nerînên xwe anîne zimên, digel hin têbîniyên giring, wekî dirêjbûna gotarên wê, û pêşiniyarek bo derçûna kovarê her du mehan, û hin dîtir. "PIRS", sipasiya herdû birayên rêzdar dike, û dê hewil bide ku hin bi hin kêmasiyên xwe kêmtir bike û dibêje: "Ez kovara hemû Kurdan im, rûpelên min ji berhem û pênûsên hemû nivîskar û helbestvan û çiroknivîsên Kurdan re vekirî ne", dîsa sipas û em bendewarê berhemên we ne.

- Helbesteke wegerandî ya "Nîzar Qebanî" digel nameyekê ji xwişka Bêwar İbrahîm gihiştiye kovarê, helbest wê di hejmara tê de bi cih bibe. Di nameyê de, Bêwarê hin bîr û baweriyên xwe sebarefî dirêjîya gotarên "PIRS"ê anîne zimên. Sipas ji xwişka Bêwarê re, û hêvîdarin ku tu bi kovara xwe re berdewam bî.

- Bûyerekî seydayî Cegerxwîn ji birêz Jan Dost gihiştiye kovarê, sipas ji kak Jan Dost re û em bendewarê berhemên te ne.

- Helbestek ji birêz Şunday bi navnîşana (Tûpişa Reş!) gihiştiye kovarê, em sipasiya te dikin digel hêviya berdewamiya nivîsandinê.

- Helbestek ji birêz "Bavê Raman" bi navnîşana "Pesnê Pirsê" gihiştiye kovarê, tê de weha dibêje:

(.. şeş sal bûme xwendevan/hû ez hîn bûm li ziman/sêzde hejmar min xwendin/min ne dizanî çendin).

Sipas ji Bavê Raman re, û hêviya pêşveçûnê jêre dikin.

- Çirokeke nûjen ji birêz "Baran" bi navnîşana (Zerdeşt) gihiştiye kovarê, tê de, xortekî Kurd bi navê Zerdeşt, navê xwe ji bîr kiriye, radibe li navê xwe digere, digihe cem cendirmeyekî û pirsava navê xwe jê dike, (... kenekî bêmirêş girte sere cendirma û got : - Wele, kûçikêkî cîranê min heye, mûk ji te bernedaye, navê wî çewto ye... gereke navê te ji çewto be ...!).

Sipas ji Baran re, digel ciwantirîn silav bo we hemiyan.

(PIRS)

